 Me des je mirdê xwe kirîye, xelkê des je fathexanîyê nekirîye. /*Me dest ji miriye şuştîye, xelkê dev ji fatihexwendinê bersedaye.*/  
 Meger dewi le cêngel, dara şeftê tunewe? /*Ma dibe ku li daristanê dara xoxê tunebe?!*/



Mergî kete gan, Xwedê daye san. /*Mirin ketiye nav gayan, Xwedê daye seyan.*/  
Meska rind yê mîyan e, tuştwarin pe didan e. /*Rûnê nivîşk ê baş yê mihan e, tiştwarin bi diranan e.*/

Mêrê bêkar, darê bêbar, bizina bêkar mîna hev in. /*Mêrê bêkar, dara bêber, bizina bêkarik mîna hev in.*/

Mirde bimore, kûnzêrîn dewe. /*Mirî bimore, qûnzêrîn dibe.*/

Mirde we extîyarî xwe berdî, we kefena xwe da derî! /*Miriyî bi serê wî berdî, dê di kefena xwe de birî.*/

Mirde zinde nawe, herî jî qunde nawe. /*Mirî zindî nabe, hirî jî nabe pembû.*/

Mirîşka diz rû we gû ye. /*Mirîşka diz rû bi gû ye.*/

Mirîşka xerîw kulli çing dekin, ketiye bin lingan kulli ling dekin. /*Mirîşka xerîb her nikil (gez) dikin, ketiyê bin lingan her tim pêpest dikin.*/

Mirîşka te we çend lingan e. /*Mirîşka te bi çend lingan e?!*/

Mirîşk ki mirîşk e, le pînika bêhêk hêk nake. /*Mirîşk ku mirîşk e, li pînika bêhêk hêk nake.*/

Mûriyê kun le herdê namîne. /*Mûriya kun li erdê namîne.*/

Mûya reş je mûya sîs girantir nîn e. /*Mûya reş ji mûya spî ne girantir e.*/

Nanê xwe meke tûrê hevalê xwe. /*Nanê xwe neke tûrikê hevalê xwe.*/

Neqîçî xizîn je bêkawî ye. /*Hîlebaziya zarokî ji ber bêkapiyê ye.*/

Nexê liva zirav e, bavê birê dirav e. /*Tayê livayê zirav e, bavê birayî dirav e.*/

Nika dîye we-mû ye! /*Niha dîtiye, (dibêje) bi pirç e.*/

Nîsk bûye gîsk. /*Nîsk bûye gîsk.*/

Ostî xar, şûr nabiri. /*Stuyê xwar, şûr nabire.*/

Parîyan, deke serîyê karan! /*Pariyan bi qasî seriyê karikan çêdike.*/

Parsiyê jinan xwar e, eger ras kî deşkê. /*Parsûya jinan xwar e, heke rast bikî dişkê.*/

Pe gulekê bihar nawe. /*Bi gulekê bihar nayê.*/

Pes sewa çi dewêjin je şîrî ta pîrî. /*Ma ji bo çi dibêjin ji şîrî heta pîrî.*/

Pez cêwi za xor dewe, berx je wî we zor dewe. /*Pez cêwî bizê jar dibe, berx bi zorî jê derdikeve.*/

Pezdar keçikdar dêmekar gunekar je xwe bêzar in. /*Xwediyê pêz, bavê keçikan, xwediyê erdê dêm û kesê gunehkar ji xwe bêzar in.*/

Pişik ne le ser zik e ne le ser piştê, ayem ku were nawe! /*Pişik ne li ser zik ê ne jî li ser piştê, mirov wisa nabe.*/

Qûrtê bê xica! /*Qurt kir û bêdeng.*/

Rastî le sifildarê jî nemaye. /*Rastî di spingdarê de jî nemaye.*/

Serê gurî nê veşartin, bewr we destan nê dagirtin. /*Serê gurî nayê veşartin, çîta bi destan nayê girtin.*/

Serê kulli gepan, gepa rastîyê debire. /*Serê her gotinê, gotina rastîyê dibire.*/

Sewa xwe niku gêrmî ke, sewa xelkê belke debire. /*Ji bo xwe nikare girarekê çêke, ji bo xelkê belgê dolmikan dibire.*/

Sexîr ki tê kewîr dewe, rûreşî we felek demîne. /*Sêwî ku tê mezin, rûreşî bi felekê dimîne.*/

Seyî derî xwe kevir kî, her kes kevir deke. /*Segê ber derê xwe kevir bikî, her kes kevir dike.*/

Seyî hestixwar hayî le kûnî xwe ye. /*Segê hestîxwar hay ji kuna xwe heye.*/

Sîyar newe le canîyan o we rê mere we panîyan. /*Sîwar nebe li canîyan û di rê de nemeşe bi panîyan.*/

Şêr degirtin, rêvî derevî. Gotin: Rêvî tu çîma derevî? Got: Ta fam kin ez rêvî me, posta min rayekin. /*Şêr digirtin, rovî direvî. Gotin: Roviyo tu çîma direvî? Got: Heta ku fehm bikin ez rovî me dê postê min rakin.*/

Şûna kergirêdayîna xwe fam ke. /*Şûna kergirêdana fehm bike.*/

Şûna şivan xwaş dewe, şûna gepan reş dewe. /*Şûna şivikan pak dibe, şûna peyvan pak nabe.*/

Ta ba nêwe dar nalive. /*Heta ba neyê, dar nalive.*/

Ta baqîl hûşî berhev kin dîn je avê red dewe. /*Heta bîaqîl hişên xwe berhev kin, dîn ji avê derbas dibe.*/

Ta dunya dunya ye je xwe ra bizan qirik reş demîne. /*Heta dunya dunya ye, ji xwe re bizanibe ku qijik reş dimîne.*/

Ta gawê reş pê le lingî te neke halî xwe nawî. /*Heta gayê reş pê li lingê te neke tu fehm nakî.*/

Ta nerrî warê paşiyê qedrê pêşiyê nizanî. /*Heta ku neçî warê paşiyê, qedrê pêşiyê nizanî.*/

Ta şemal nêwe, dar nalive. /*Heta bayê bakurî neyê, dar nalive.*/

Te dû isparte pişikê. /*Te dûv sparte pişikê.*/

Te gaw gorîye, doçik maye. /Te ga gurandiye, boçik maye./

Turiyê rind yê rîvî ye goştê lezîz yê kîvî ye. /Tiriye rind yê rovî ye, goştê lezîz yê kûvî ye./

Tuştê kûtî dagir sewa royê kûtî. /Tiştê xerab veşêre ji bo rojên xerab./

Tule je kûçîtî da. /Seg hê di tûletiyê de./

Umra qijqirikê çel ro ye, her çi xicaw deke bia bike. /Temenê çirçirkan çil roj e, her çiqasî diqîje bila biqîje./

We ar û we mar wi çi yekim?! /Ha bi agir ha bi mar bî, ez çi bikim?!/

We devê gotin je avê red we û got: Lêvê min kul e! /Ji hêştirê re gotine: Ji avê derbas bibe, û gotiye: Lêva min kul bûye./

We devê gotin ostîya te xwar e. Cewaw da: Kendê min dûz e? /Ji hêştirê re gotine stuyê te xwar e. Bersiv daye: Kî dera min rast e?/

We gega, terî îmamî çepa. /Bi axaftinan, tu dê herî cem serokê derewînan./

We giryanê kes têr nawe, we gepan kes şêr nawe. /Bi girînê kes nabe têr, bi gotinê kes nabe şêr./

We mûyekê gaw beş nawe. /Bi pirçekê ga beş nabe./

We sêri mekişe kanîyan, we şev mere ser xanîyan. /Serê xwe nede ber kaniyan, bi şev neçe ser xaniyan./

We tûna mêşînan kev, ta fam kî gur kîja ye. /Bikeve postê mihan da ku fehm bikî gur kîjan e./

Xazî her kes le feka wî şîrîn e. /Xweziya (gilêza) her kesî bi devê wî şîrîn e./

Xelat ku we keran çû pe devan veegere. /Xelat ku bi keran here, bi hêştiran vedigere./

Xelk le êvarê berve malan, şivan paşe malan. /Êvarç xelk ber bi malan, şivan pişt li malan./

Xew û merg yek e. /Xew û merg yek e./

Xwenga min çû we lê ya, hêfa benîştê fekê da. /Xwişka min çû bi lehiyê ro de çû, heyf li benîştê devê devê wê./

Xweyê çîyan dewinê ku berfê lê dibarîne. /Xwedê çîyan dibîne ku berfê lê dibarîne./

Xurişê tûr im, je kulê karan dûr im. /Toraqa li tûr im, ji hemû karan dûr im./

Yara canî kê m peyda dewin, ema her çi yara nanî pir e. /Yarên jidil kê m peyda dibin, lêbelê yarên xwarinê pir in./

Yara rindê yar e, pe te hemkar e, yara kûtfî serbar e. /Yara baş yar e, bi te hevkar e, yara nebaş serbar e./

Yê darê bîyê sû ye. /Dara biyê bi siha dar e./

Yê kera nêr harehar e, gepa latan qareqar e. /Karê nêrekeran ziqezîq e, axaftina qureyan qîjevîj e./

Yêkê bernedine bêçînê, das û weris ki je yekê hilnagirin! /Heke kesî tu neşandiyî giyadirûnê ma das û weris jî ji te standine?/

Yêkê dîkê mêyvanyariya xwe dizî hînê şev wû we rê ket. Xadîyê xanê got: Aşne çi ecele te heye? Bise bira dîk ban ke! Mêvyanê got: Eyî aşnecan, dîk ê eger ban ke le rê jî ban deke! /Yekê dîkê mazûvana xwe dizî, hêna şev bû bi rê ket. Xwediyê xanê got: Filan kes çi eceleya te heye? Bise bira dîk bang bide! Mêvanê got: Wey filan kes dîk ê heke band bide di rê de jî bang dide./

Yêkê we lawê xwe ra got: Hespê bûwe avê! Lêw cewaw da: Didana min alû ye. /Yekê bi lawê xwe re got: Hespê bibe avê. Lawî bersiv da: Diranê min alû bûye./

Yêkê weşe nedekir piştîyek êzing weyîne, veris we dora cêngel da dekişand. /Yekê nedikir piştîyek êzing bîne, werisê dikişande dora daristanê./

Yêk je birçîyan derpê xwe kiriwû firoşê, yêkê digot pe kalana şûrê aliş nakî! /Yek ji birçîyan derpê xwe derxistibû firoşê, yekê digot bi kalana şûrî aliş nakî?/

Yêk nêdiliştine kelê, degot zîna espê min bûne mala kedxudê! /Yek nedihîştine gund, digot: Zîne hespê min bûne malê muxtêr./

Yêk we zik da lê dexistin, degot: Wax piştî min! /Yek bi zik da lê dixistin, digot: Wax piştî min!//

Yêk zor nedegêşte kerê, depirande palanê. /Yek zor nedigihîşte kerê, radipeliya palanê./

Yê şivanê şiv, yê bûkan jî ling. /Yê şivanî şiv, yê bûkan jî ling./

Zemîn ku zor dewe, ga je gê dewîne. /Zemîn gava zor dibe ga (sedema wê) ji gê dibîne/

Zika têr hayî le birçî nin e. /Zikê têr hay ji birçî nîn e/

Zimanek şîrîn xwe heye, gişt tuştê xwe heye. /Zimanekî wî yê şîrîn heye, her tiştê wî heye/

Zimanê xaş mêr je kunê verdêxinê. /Zimanê xweş, marî ji kunê derdixîne./

Ziman ku şîrîn e, mîvan xurîn e. /Ziman ku şîrîn e, mêvan xurîn e./

## 1. 2. Tiştonek

Yerime serî diyarekê, ban dekim hezarekê? (bilûr)

Yerime serî diyarekê, sê qîştik le warekê? (ûcax)

Darê terê, le guherê? (pizdan)

Tendûrek himhimî, tiji nanê genimî? (kundî: sîloya gênim)

Kundirê we dem, bîçax le cem? (jina avis)

Tiştêkê min heye, yere yere, yegere, êvar veegeri, weqes pênc qeraniyekê, şûnekê yegire? (darê şivên: şiv)

Desmalê yavême çalê, ta salê? (ji ber ku di maweya salekê de dizê: deve)

Xwengek min heye, we kulan? (qaqizîk: cureyek pîvazên şirîn)

Xaniyek min ê teng i tarî, le ortê ar debarî? (tendûr)

Tiştêk min heye: seri mar e, mar nin e; giyaxur e, kar nin e; textê piştê dar nin e? (kûsî)

Yerime nalekê, kuli Seydê seri çalme? (horzelik) çalme: şaşik

Terime nalekê, kuli Seydî seri mendîl? (horzelik: ûzelik)

Terime tepan, kuli tepan diwînîm, yekê nawînîm? (tepê serê xwe)

Tiştêk min heye, tere je kuli çiyar bilintir, ji tûmî hewşanê jî pesttir? (çûçik, rê) pest: nizim

Çûme nalekê, binî wî nala çalek e, ortê wî çala marek e, fekê wî mara arek e? (çira, lokiz)

Terime nalekê, sê qerexan le wer arekê? (sê kîlê ûcaxê) kîl: kevir, ûcax: kuçik

Sing û tevnî je merxê, xica tere Kela Alxê? (gule, tifang)

Xwenga me we talingekê, baz dewa ser singekê? (meşk) taling: yekling

Tiştêk min heye je tiştan, gilor e natê kiştan? (sêvtalik) kişte: mêweyê hişkîrî

Xwengek min heye, we xwe qewrê xwe yekole? (dilop)

Kalikekê rûbayayî, min tepêk li serê dayayî? (bêye) bêye: xurom

Birek çîni seri bizdiyayî? (xalî, ferş)

Kalikek pêxwar, canê me xwar? (ispî) ispî: spî, sipih

Deve naxwe, efsar dexwe? (biyac) biyac: cureyek darebî ya ku şaxên wê digihêjin erdê

Tepê min i bîvîlgiya? (seriguri)

Dêr yelivînîm, berfê yebarînîm? (êleg)

Tendûrek min e yekenan? (fek, dev)

Hinc hinc, bavê kunc? (weris, kindir) hinc: bigere  
 Xirxirûnek we rê ket, çul û pala bi dû ket? (mirîşk) xirxirûnek (bi xeyna erebî):  
 gindorek; xir xwarin: gindirîn xir dan: gindirandin  
 Dareke rende neyye, arteke êleg neyye, kirasek e derzî neyye? (îgde, sincid)  
 rende: birek; art: ard; êleg: bêjing; neyye: nedîtiye  
 Kalikek min e şuştî miştî, li usti dapîrî te niştî? (kundê avê) kund: eyarê avê;  
 ust: jor  
 Piyênc birê min, le piştê hev kar dekin? (pîjê kurikan:) şîşikên goreyan  
 Devê êx dekim, dorê mîx dekim? (kwînd:) kon  
 Birek kerê min we palan le yanê? (qewristan:) goristan  
 Darê hişkê le kurmişkê ? (mar)  
 Xanîk teng û tarî rûniştine du milwarî? (çav) milwarî: mirarî  
 Yere asmîn hez deke, têye zêmîn gez deke? (bivir)  
 Golikek min wû paçxur? (qaçî:) meqes  
 Kalikê piştixwar canê me xwar? (ispî)  
 Xanî yek min wû yêke tîr? (kufkarik:) karî, kuvark; tîr: kutek, stûn  
 Memiye swîç ê salê, gildîgildî le darê? (turîya swîr:) tiriya sor; gildîgildî: daliqî;  
 memi: memik; swîç: sor û spî  
 Aş aş, du çira le paş, meydanê kîvî, du kunê rîvî? (şikil:) rû  
 Qirpe gilor fisan tîne? (şelxem) qirpe: qurm; gilor: gilover  
 Hîp hîp axce kilîp? (zimana gê)  
 Mejme tiji nar e? (ûcax) mejme: sinî  
 Gilîgilî tepe, doçik rep e? (avtefe:) misîn

### 1. 3. Kurtkirina navan

*Atê:* Ayet

*Am:* Amine

*Ayem:* Adem

*Bax:* Baqir

*Bayir:* Behadir

*Ber:* Behram

*Bewr/Bewrxan:* Behadirxan

*Bit:* Berat  
*Cef:* Cehfer  
*Cel:* Celal  
*Cem:* Cemşîd  
*Cew/Cib:* Cewad  
*Çir:* Çiraxelî  
*Ebil:* Ebulfezl, Ebulhesen  
*Ek:* Ekwer  
*Ekwer:* Ekber  
*El:* Elî  
*Ep/Ebês:* Ebas  
*Esq:* Esxer  
*Esela:* Esedulah  
*Evd:* Evdila  
*Ex:* Ellahxan, Elîxan  
*Eya:* Yehya  
*Eydik:* Eyd Memed  
*Fat:* Fatime  
*Fer:* Ferecullah, Ferhad  
*Fet:* Fethulah  
*Fîz:* Fîrûz  
*Gulc:* Gulcan  
*Hac:* Hacer  
*Had:* Hadî  
*Hem:* Hemîd, Ehmed  
*Hes:* Hesên  
*Heselî:* Hesên Elî  
*Hewîw:* Hebîb  
*Heyd:* Heyder  
*Huc:* Hucet  
*Hus:* Husên  
*Îb:* Brahîm  
*Îs/Îsmîl:* Îsmâîl, Îsa

*Îwrîm*: Brahîm  
*Kaz*: Kazim  
*Kil*: Kuwra  
*Lel*: Leyla, Leelbanû  
*Mawanî*: Mahbanû  
*Mec*: Mecîd  
*Mem*: Mihemed  
*Mer*: Mehemed Rehîm  
*Merd*: Merdan  
*Merem*: Muherem  
*Mereyîm*: Muhemed Rehîm  
*Merz*: Merziye  
*Mes*: Mesûme  
*Mesen*: Muhemed Hesên  
*Mesên*: Muhemed Husên  
*Meyne*: Medîne  
*Meyr*: Meyrem  
*Mêr/Mêrd*: Mêhrdad  
*Mirc*: Mircan  
*Mirt*: Murteza  
*Mis*: Muslim  
*Mist*: Mistefa  
*Mişt*: Mucteba  
*Mit/Mîd*: Mêhdî  
*Miz*: Mezahir  
*Mûs*: Mûsa, Muhsin  
*Nad/Nayir*: Nadir  
*Nec/Nic*: Necef  
*Newrzeli*: Newroz Elî  
*Nex*: Neqî  
*Nêm*: Nimet  
*Nik*: Nergiz  
*Nûr*: Nûredîn



Om: Omîd  
*Pîr*: Pîroz  
*Qas*: Qasim  
*Qeys*: Qeyser  
*Qud*: Qudret  
*Qul*: Qulam (Xulam)  
*Qur*: Qurban  
*Raz*: Raziye  
*Rec*: Receb  
*Rem*: Remezan, Rehîm  
*Res*: Resûl  
*Reş*: Reşîd  
*Rez*: Riza  
*Ruq*: Ruqiye  
*Rûla/Rût*: Rûhullah  
*Sab*: Sabir  
*Sek*: Sekîne  
*Sel*: Selbî  
*Sem*: Semîra  
*Sen*: Senem  
*Sic*: Secad  
*Sil*: Silêman  
*Sîm*: Sîmîn  
*Sîr*: Sîrûs  
*Sux*: Suxra  
*Şasên*: Şah Husên  
*Şek*: Şeker  
*Şer*: Şerefxan, Şehram  
*Şerwanî*: Şehrbanû  
*Tar*: Tahire  
*Tat*: Dawid  
*Teb*: Teyibe, Teyib  
*Tex*: Teqî

*Umê: Umulbenîn*  
*Ûs: Yûsiv*  
*Xec/Xeyce: Xedîce*  
*Xel: Xelîl*  
*Xês: Xeyrunisa*  
*Yex: Yeqûb*  
*Yûn/Ûc: Yûnis*  
*Zer: Zehra*  
*Zên: Zeynew*  
*Zil: Zilêxa*  
*Zîn: Zînet*

#### **1. 4. Sêxiştî**

Kevnê serî te mermer e  
Avê fekê te şeker e  
Şeker nin e, rûnê zer e

Ez çûçikek qelemkar im  
Le ser darê çing we xar im  
Kurma kûtî ez dexarim

Dilê min û te ba yêk wu  
Ba duşmenê me kelêk wu  
Çavê doşmen ba we hêk wu

Kevnê serî te awî ye  
Cayîlan le ser te dawî ye  
Ka şansê kê rawîye

Kevnê serî te gulkesk e  
Anîye wer me nan û meske  
Çavan biyoş şikil gez ke

La şivano Xweyê qewtê  
Le zuhîrê nan û dew tê  
Le taştî ye yar we xwe tê

Lo şivanê qûyeqû ye  
Serê pezê te le kû ye  
Çi şivanek bêavrû ye

Pezê bavê te belek e  
Le paş xanîyê me mexel ke  
Mexel nakî je vira rake

La şivanê ser av ke  
Pîşîyê bibir we delav ke  
Nîrî pîşîyê we dirav ke

La şivanê pez ku pir e  
Je hêrê tê guregur e  
Gur girtîye mîya kur e

Kumqemera kumqemera  
Je cûlgê têtî çî xewera  
Mizgînîya te berxa qemera

Her çî dewêm je tehê dil da  
Bariş barî daran gul da  
Te kînga wû dil we min da

Çere şeftîm bû me mere  
Verkev henî çolek fere  
Ne te xêr dî ne min bere

Çûme çîyan, çîyan sar kir  
Hatime malan, malan bar kir  
Derdê qerîwîyê le min kar kir

Ez çûçîkek balesîs im  
Her name î bîn denivîsim  
Sewad tune bixînim

Kevnê serî te çarxed e  
Bejnê min û te hemqed e  
Sed sal here nakim terke de

Pezê bavê te mêşin e  
Le kulûtan yeyoşine  
Bask û pîlê wan yêşine

Malan danî bîne bîne  
Şilwargewrî le ser zîn e  
Dilî min ku je wî xwîn e

Derdê dilî min ku karî ye  
Qosan canê min xarîye  
Yarê kûtî naçarî ye

Le ser xanîyek bilind bise  
Bira here qem û qose  
Va derdî te sa min bes e

We gulekê bihar nawe  
Jin rindina mêr kal nawe  
Mêr jî rindo jin pîr nawe

Keçikan bê dil mezewicînin  
Mavên êr meşewtînin  
Le wê dunê şûn nawînin

Le bêdilan gune gune  
Kesê bêdil kezew kun e  
Yeşewtê û çare tune

Derd le min hezar hezar  
Kûçe le min bûne bazar  
Qem û qosan canê min xar

Kwînda reşê kwînda kê ne  
Du çavreşan dêw dekêne  
Min pirs nekir qêza kê ne

Je me wêya kelê axan  
Keçik çûne seyîlê baxan  
Av hiltanîn je çeyîlaxan

Du mal ber ve hev ûn  
Keçik lawik telve hev ûn  
Yê qiçik çav le hev ûn

Dîtmam pismam terazî ne  
Le rûyî hewê yewezîne  
Le rûyî Meke hevdu dîne

Derdê dilê min ku pir in  
Histirê min ku guregur in  
Le owê me ku gep pir in

Le merzê Erkê, Birno le terkê  
Min mavêj we gepê xelkê  
Le merzê ha me, yeşînime name

Her çi min go ez le yarê  
Qayîm dewêm xelk yeqarê  
Min ku neyî ew carê

Av rewan e av rewan e  
Girêyane le deyman e  
Xweyî keçikan xanteman e

Keçikan we malê pir mexapînin  
Mavêne êr meşewtînin  
Le wê dunê şûn nawînin

Ar bigirê eskenasan  
Jinan dene her kelpasan  
Ar bigire malê mêran

Her çi min go je tehî dil da  
Baran barî daran gul da  
Memê keçikan kiras hilda

Kewingewrê le panîyê  
Sexil berda ser kanîyê  
We xwe çûye mîvanîyê

Verketime qarşa kelê  
Yefikirim bejn û balê  
Here memîn je hevalê

Çîyayî ser me pir we merx e  
Kirîye cêran daye wer xwe  
Dest davênê Xweyê ser xwe

Çavê reş ê çavê maran  
Şikil kirîye denê naran  
We destgirti çav le yaran

Fatime le tênge  
Nan le bin çêng e  
Xurakî wê hûrika qênd e

Je êvar da şeftîn çira  
Rûniştine xweng û bira  
Xwengê qiçik biwe vira

Darê merxê darê merxê  
Le dorê te ketime çerxê  
Mîna mîyê çav le berxê

Ez we dil wûm bê dil kirin  
Per û bala min şiv kirin  
Le halê min zulim kirin

Arê min û te bûye çîya  
Qamîş kişîya bûye gîya  
Çere temê me bizdîya

Qereqûm e qereqûm e  
Du çavreşan daye dû me  
Yêk Hacer e yêk Mesûme

Yêkê tu bê, udîyan eza  
Malê çûne bûte geza  
Qoşwan ezê sîngpalûz a

Ser hilînim le kevîran  
Çere bûme xanewêran  
Le karê xwe mame heyran

Keçik revîye kevin ketîye  
Berf barîye red peyda wîye  
Şivanan dîye hılanîye

Le deyîrê xîn le deyîrê xîn  
Keçkan gir ke je mal verxîn  
Dê û bavan we girî xîn

Xwoş we halê dudîyê we-dil  
Berê dunê wan her duyan bir  
Satekê newune qafil

Tu ku yerî min çer deki  
We desmalê ciwê xwe kî  
Le her derê min je bîr nakî

Ez gulek wûm dame te ya  
Here, meke nazê xwe ya  
Axir dekim terka te ya

Baxê tiji baxê tiji  
Kevir mavêj gul yeriji  
Yar halî wê min yekuji



Ser kanîyê xalî nawe  
Kevir mavêj halî nawe  
Dilê wê je min xwîn diwe

Damanî te xane xane  
Rêyî avê meke mane  
Yekî mane, meke kîne

Yerî yerî aram bigir  
Ye pê te me vir da bifikir  
Tayana te dila min bir

Derî kelê le min megir  
Le serî rê min damegir  
Eger kûtî me min hilmegir

Le pîşî hespan desmalê destan  
Ez pîşî hespê te danagirim  
Ez te lawikê hîlnagirim

Siwê rwîn da wexta mangan  
Keçik çûne wer zimangan  
Me yekujin ye tifangan

Gulbûte me golbûte me  
Je êvar da we dû te me  
Cayîla taw xwe, ku ez dîya te me

Darê biyê caxebal da  
Du qerîwan le wer yan da  
Halî newûm kînga can da

Gulerwan e gulerwan e  
Avê fekî te derman e  
Derman nin e çi erman e

Gulê gênim gulê gênim  
Pê le te kim, te bişkênim  
Tu yî yerî te nawînim

Kevnê serî Nenexanimê kîş e  
Nenexanimê wîşewîş e  
Şerefxan ketîye dilêş e

Çîyê serê çîyê serê  
Xurcîn avitîye ser kerê  
Ebas sekinîye le hemberê

Çûme çîyê Aledaxê  
Par e mest ûm le vê çaxê  
Îsal ketime je demaxê

Je êvar da ez le çolê  
Bûme rîgê binê golê  
We qurwan e şilwarqolê

Je çîyan da daketim  
Ger rûniştîm ger raketim  
Je qismetê te verketim

Çûme çîyan, çîyan sar kir  
Hatime malan, malan bar kir  
Te dî, yarê çere je me qar kir

Kevinsîsê le panîyê  
Sîyar wû le canîyê  
Du çavreş rûniştin le ser kanîyê

Bejin kişîya, bûye mû ye  
Tu je bîrê me neçûye  
Lo şivan çav we dû ye

Elê cayîlê le Erkê ye  
Sîyar wîye le hespê ye  
Hînê çava keçkan we dû ye

Kevnê serî te hilînim  
We kûçê da birevînim  
We Şerefxên gînim

Ez jî ezew tu jî ezew  
Xweyê le me kirîye qezew  
Ne te dil ne min kezew

Le xwe meke duşilwaran  
Mere meger le cînanan  
Meke dilê min xîyalan

We kûçê hatim çûma  
Je tilîga lingan bûma  
Le ser lingan venda bûma

Ez keçikek bûm çûme çolê  
Xwîn dibarî ji her golê  
Hîsîr ketiwûne nav gulê

Çavê reş ê çavê maran  
Sivîldarê telve daran  
Ew serverê kulê yaran

Zendê bozê we bazin a  
Daweşand serê min a  
Le ser qarê şevçînan

Kevnê serî te hêşin e  
Çavê birîyê te mêşin e  
Sa te ra pêz dedoşine

Espê bavê te mele ye  
Dil sa te ra dikele ye  
Zulfê te sa min cele ye

Kevnê sûrê gulşeftalî  
Ez tême mal çima nêlî  
Nata le min tu bêdil î

Pezê bavê bejinruq e  
Kincê birê çekê çuq e  
Sa keçêkê yekim qulîq e

Berde berde berde  
La hesina zenda min berde  
Dila min pir we derd e

Lê yarê lê yarê lê yarê  
Serê hîsîr gîşte Xêwe, Buxarê  
Ez canê xwe dedime serkarê

Va şevana çere şev in  
Xew le çavê me nakevin  
Yar we tenê ranakevin

Hezarçîşme pir we xwîn e  
Yar le ser xwînê dixwîne  
Dila me kirîye birîne

Tirman berda ye erqîyanê  
Mal pir birin je şuqanê  
Serê tirmin giştîye similqanê

Qanat tune pê bifirim  
Berve malê we bifikirim  
Yar dewê te hilgirim

Hewa dolan hewa dolan  
Were malê me we solan  
Solan dêxin were cilan

Le nav baxan le nav baxan  
Mede min du aledaxan  
Xweş we halê wan çaxan

Desmalê te desmalê te  
Le min lêxist şemalê te  
Ez gîştîme cemalê te

Kanîşeftê pir we merx e  
Le sûyî merxan kar û berx e  
Dengê tîfing meyîne ser xwe

Cûlgê me Mane germ e  
Tirmin berda ser me  
Şûnî me Cacerm e

Le bîrîyê î sexil koz kir  
Şemal rawû toz kir  
Dûgmê vewû meman boz kir

Keçika, te dilkê min kul kir  
Orxan avêt ser min cil kir  
Hêstirê min orxan şil kir

Hewalî we orinç e  
Çêdir teyî ke dayîn boxçe  
Ez qurwanê memê qunçe

Terî avê, manêkê çêke  
Derî hewalî me we rê ke  
Solê nîşanî tu we pê ke

Dilê min a dilê min a  
Ar berdan gulê min a  
Kê hilanî gunê min a

Here here tu leng mewe  
Bira dilê te teng newe  
Here sa te direng newe

Li nav pêlûz, li nav pêlûz  
Rûniştine bûk û baldûz  
*Işqê we her duyan ez kirime nîmsûz*

## 1. 5. Nifir

Here ku xêr û berê newînî!  
Here ku je cewanîyê xwe xêrê newînî!  
Cewan merg biwî!  
Here ku gulîyê te le qirtikî te bişirê!  
Nînika te swîr newin!  
Sêv û narê xwe newînî!  
Here ku tuxmçem te bigirê!  
Paşepê le te kevi!  
Ji nexwî!  
Zimanreşik te bigiri!  
Berê te berve Xêwe û Bixarê vebiwi!  
Zulma te bişefti!  
Here ku dar je mistê te nekevi!  
Here ku her dem we dest te dar û pêş te we pez!  
Zikê te têr newi!  
Zikek te têr û zikek birçî bimîni!  
Nanezikê herî avê!  
Marek reş le ser dilî te bigirê!  
Kevirek we pêş te û yêk we dû te!  
Le yasê te rûnim!

## 1. 6. Çîrok

### 1. 6. 1. *Denenara qêza kêlik*

Kalikê çîroka me pe qêza xwe zindigî yekir, jinebîyek jî ku we tenê guzeran dekir, cînara wan bû.

Wê jina pir xatirxahîya qêza kêlik dekir, le dorê yekete tawê, seri yeşiwîşt seri guli yekir, hey pê ra digot:

– Eger tu yeşe kî kekê xwe razî bikî min hilgiri qet nêlim tu xwuritîyê bikşînî, ez şûna dîya te jî yegirim bavê te jî gune ye.

Keçik jî pir xwoşhal dewû ku yeşe yeke we kesekê bê dayîk, sa lûma we bavê xwe got ku were cînarê hilgir hem sa te ra jinek rindê ye hem sa mi ra dîyêk rind e, bavê go:

– Na qêza can ez je wexta ku dîya te mir qet min dili xwe tune. Dare jî min sûnd xwarîye ku qet jin nekim.

Denenarê daye qilqilîtîyê got:

– Te sûnd xwarîye ku jin nekî gunê min çî ye, min ku sûnd nexwarîye ku bêdê bimînim. Kekocan kekocan kir ta bavê xwe razî kir.

Dare kalik jinikê hildegiri, we dû salan qêzekê jî sa kêlik tînê, aram aram je dê bûnê verdekevê û dewê dêmarîyek zalim.

Royek je royan we mêrê dewê:

– Denenar ê hilîn, here piştîyek hêzing beref kin. Kalik dewê:

– Jinik me ku hêzingi xwe pir heye, hêzingan naxazinî, çima herime hêzingan? Lê jinik des je mêrê nake, ew jî daye destê Denenara xwe yeke û yere hêzangan.

Roya rinê jinik we mêrê dewê:

– Gerê qêza xwe bêred kî, nizanim her torê ku tu we xwe zanî. Ya ez û qêza me, ya jî Denenar?

Mêrik jî pe derdek giran daye destê Denenara xwe yeke û yerine hêzingan, her çî Denenar dewê:

– Keko vina ku giştî hêzingin sa çî beref nakinî? Bav dewê:

– Na, qêza min, henî pêştir hêzing beref kirine wan hilînî.

Yerin, yegine hêzingini berfkiri. Dewê:

– Keko vina jî hêzingê berfkiri, lê sa çî beref nakinî. Dewê:

– Keça min, henî pêştir dereke hêzing piştî kirine, hazir in; feqet em henî le pişt kinî û bûnî mal. Dîsa qêza xwe yexapînê, yerin yerin yegêne derekê ku hêzing piştî kirine. Denenar dewê:

– Keko le pişt bikinî û henî mal. Dewê:

– Keçika min, vina kê in. Tu rakev ez henek darê rinê jî qule kim, dare henî. Tu jî ta wê çaxê rakev. Denenar jî ku westîya wû le bin darekê yekevi xewê. Kalik kundirê we-tal le ser serî qêza xwe ewzan deke û ba jî hey wê lêxini dêr. Denenar jî ku çav we xewê ne xîyal deke teqeteqê bivirî kekê ye.

Denenar çava xwe ku veyeke dewîni teqeteqê bivirî nin e, kundir e!!! Bav jî tune, teze têye xwe, ku sa çî bavê yego henî dûr dûr, hêstir rijand hêstir, we xwe ra got:



– Gunê bavê min jî nin e, kulli gunê min we xwe ye, ew jinika min kire derî bavê xwe, wû bedbext.

Ser hilanî, raçîyan ket û hêstir rijand, ta ro berve zerikan çû ew jî we rê çû, je dûr da tutûnek dî û xwe le tutûnê kişand, nîzik ku bû dî kwîndek e, kes tê ya tune, kwînd malişt û ûcax jenîya vêxist, kundûk daye ser êr û şîv jî hazir kir, dare jî kete bin cazê devan.

Le wî kwînda sê bira deman, ena we pez û dewar bûn, je sê biran red wû, wan kesê xwe tune wû

Çaxê ku her sê bira vegeşîyan, çarçav bûn, je hev pirsîn te mal temîz kirîye her sîyan got na gotin minê kê temîz kirîye? Ta sê royan va hekeyeta sa wan dayeket, ta ku we hev da le derê kwînd gotin ku yek je me le vira xwe veşêrê ka kî tê mal temîz deke? biran bêce kir, navê birê mezin verket, dare wî jî xwe le bin cilan veşart, demek ku red dewi dewîni keçîkek rindik je bin cazan verket û dest we xemiladinê mal kir û dîsa kete bin cazan.

Birê girê aram aram je bin cilan verdekevi û yere deri kwînd, çav le rê biran demînê. Bira ku tèn sa wan dewê ku çî dîtî ye. Dare pe hev yerine cem cazan, ban dekin:

– Tu her kes î, cin î ya ins î, me tu dîtî, verkev. Dare keçîk verdekevi û dewê:

– Ez ayem im, bavê min ez le çolê terikandim, min jî tutûna ûcaxa we dî û berve mala we girt, hatime vira. Her sê biran jî got:

– Te rind kir, le mala me tu jin tune, em her sê bira we tenê guzeran dekinî. Tu vîna çend royana pir zehmet kişandîye, her çî dilî te yexazê em were yelivinî, eger yexazî destê xweng û biratîye bidî me em hazir inî, ya jî eger yexazî pe birê me û mezin bizewicî? tu û dila xwe.

Denenar xast ku pe birê mezin bizewicê, ena jî pir xwuşhal bûn, zindgîya wan je sûyê serî Denenarê bûye xewn û xîyal.

Dîk halî dewe baz deye ser tendûrê û ban deke: Qî qûlû qîq, ne te dî xêr ne min, Denenara qêza kêlik dî!!! Le filan derê kirîye kêf.

Pîrikê jî ku lê xweş nehat dîk kiş kir û go:

– Kiş, kiş e tu çî yewê? Kalik jî ku halî wû go:

– Dîkê can care rinê bê.

Dîkê dîsa ban kir:

– Qî qûlû qîq! Ne te dî xêr ne min, Denenara qêza kêlik dî!!! Le filan derê kirîye kêf.

Jinik weqes we gir wû taqet nekir, mêri xwe siwê we reş da rakir û xurcîn avite ser dêlikekê, we rê ketin, ta herine cem Denenarê.

Dema ku yegêne cem Denenarê, mêr pirs deke:

– Denenar vina kêne? Ew jî dewê:

– Kekê min û damarîya min in. Sa xatire Denenarê sa wan berxekê şer jê yekin, wan le ser çavê xwe dayeyînin. De nîzika raketinê Denenar je mêrê avini yexazi, ta mêr yexazi rawi pîrik celd baz deye, dewê:

– Na, na zava can, ez we xwe sa qêza xwe avê tînim, hînganê camê tiji av deke û hengolûskî xwe jî yavê ortê camê, pe zimanşirînî û qilqilîtîyê avê yeye keçikê, ew jî avê veyexwe û rayakeve.

Jinik ku fisa xwe kirîye dîsa we reş da rayewi, bane mêrê xwe yeke û we rê yekevin, her çi zava dewê bisekinin Denenarê jî rakim jinik nêli û dewê: Gune ye bira rakevi qêza min, gune ye duhonê pir kar kir westîyaye.

Nîzik zuhîrê wû hînê Denenar ranewû, mêr dewê:

– Ka herim ç esaw e Denenar ranawi? Yere ser veyeke ku Denenar tune, le nav hev da hişin wûye can jê kişîyaye, bane biran deke, yewê:

– Çere kunî? Hetmen wê jina fêndek rijandîye, keçik kuştîye, birano ez ku qîmîş nakim Denenarê bikime bin herdê hûn çi dewên? Biran go:

– Em jî qîmîş nakinî, dewên, le ser devêkê sîyar bikinî, alekê tiji zêr alekê jî tiji zîv bikinî, bira deve here, her derê yere bira here. Ena jî haka yekin, devê we rê yêxinin.

Lawê padişê pe wezîr û wekîlê hatine şigarê, je dûr da dewînin ku devek we bar bê xwedî tê, lawê padişê rû le wezîr û wekîlê yeke û dewê:

– Bar sa min û deve jî sa we her çi hewû. Ena jî neqîçî nakin û qewûl yekin, deve ku nîzik dewê yewînin ku cinazêk le ser e, hiltayînin û yewine şêr, xelk le dorê beref dewi, piçepiç rayewi, her kes sa xwe ra tuştêkê dewê, le vî orta xizanek hey dev daviji cinazê, dê nêli yekşîne, ew jî des jê nake. Dare padişa dewîni, dewê:

– Berdin, ka ew xizana çi yexazi? Xizanê berdeyin, ew jî destê xwe yeke gewrî Denenarê û hengulûskê verdêxini. Denenar têye xwe, çav veyeke, le nav şerekê ye, jê pirs dekin:

– Çi bûye, je ku tê yî? Ew jî dewê:

– Dêmarîya min des je min nake, her derê yerim, tê zehrê xwe yerîjîni.

Lawê padişê dewê:

– Ez yexazim pe te zindigî kim, ema evel gerê wê marê reş je zindegî xwe pak bikim. Dare serbazan yeşîni, ta herin pîrikê tîş tîş bikin. Dare jî heft şevaneroyan yeke dawet.

*Çêrokê min çûye geştê, bend û bilûr le piştê, le bina guçika we xweş bê.*

### 1. 6. 2. Qurîşmergan

Mêrikek wûye, yeçûye şigar lêxistinê, navê wî Qurîşmergan wû.

Qurîşmergan ayemek feqîr û bêçare wûye, tiştê xwe tunewûye, doran pe kew girtinê gozeran dekiriwûye.

Rûyekê ku yere şigarê xicayêkê yebîse, yere dû xicawê, dewînê marek reşê radû marek sîsê yeke, xicawa wê marê sîs jî natê xicawê keçikek wû. Dare dil şewtî, dixast je dest marê reşê xelas bike, tifangê xwe amade kir û nîşane girt ta marê reş gule ke. Ema doça marê sîs qule wû û ew pir pir narahet bû.

We hezar fikr û xîyal çûye mal.

Le kelê dawet wû, bane Qurîşmergan jî kirin, dil nexast here; ema je tenîyetê xelkê çû le kuncêkê rûnişt.

Her çî banê kirin, were bilîz, were nên bixwe, wî qebûl nekir. Jê pirs kirin:

– Çi wûye, çima narahet î? Qet tuşt negot.

Êvarê mar kulli kişîyane qewaxê, paşayê maran dît ku doçê qêza wî bizdîyaye; rû le qêza xwe kir û jê pirsî çî wûye? Got: Merganekê ez gule kirim, doça min qule bû.

Paşayê rû le du-sê maran kir, got:

– Herin wî peyda kin, eger xwuşal wû ku werre lêxinin ku le şûna xwe nikowî hulistî, eger jî narahet wi xwe bikine tûna ayeman we rêkê bikşîninê vir.

Maran redê wî lêxistin û çûn le dawetê dîtin, ku narahet e yekişine cem û we manikê yekşînine der. Pê ra dewên:

– Were, henî derekê, rûninî, gep kinî. Ew jî qewûl yeke. Nîzikê qewaxê ku yewin we Qurîşmerganê dewên:

– Em niha ku çûnî ortê, netirsî ha. Em kulli mar inî niha jî ketinî tûnî ayeman.

Dewê:

– Xa. Dewên:

– Tuştêk dinê jî heye, em çûnî ortê, paşa je te pirs kir, çi yexazî bê tuşt naxazim, ta sê caran bê naxazim. Dare bê tûfê fekî min ke! Qorîşmergan jî ku mat maye dewê:

– Xa.

Yerine ku ortê, paşa we qar dewê:

– Te doça qêza min qule kirîye? Ew jî dewê :

– Ê.

– Lê çima te qule kirîye, he? Qorîşmergan dewê:

– Min dî ku marek reşê yeye dû marek sîsê, denga marê sîs jî dengê zelal bû, dilê min şewtî, yexast marê reş gule kim, lê çerre kum, xwelli serî min bixwe gullê min doça qêza te qule kir. Pir pir jê ra narahet bûm, hînê jî narahet im û xwe qet nabaxşînim. Paşa dewê:

– Wî marê nas deki? Got:

– Ê, eger biwînim nas dekim. Got:

– Pes biger, ka kîjanê wûye. Qorîşmergan her çi çav degerîni nawîne, dewê:

– Na, le vira tune Paşa dewê:

– Çav bigerînin kî tune, her kes tune, herin weyînine vira. Marê serbaz yerin, bane marê ku le der mane yekin, marê reş je dûr ku tê. Qorîşmergan wî nas deke we paşê nîşan deye, paşa jî destûr deye ku bigirin je ortê bikine du tîkan û tîş-tîş kin.

Paşa je Qorîşmergan pirs deke:

– Tu çi yexazî? Her çi bixazî ez yeme te. Ew jî dewê:

– Ez tuşt naxazim. Paşa dewê:

– Tuşt ku nawi. Ta sê caran pirs deke û Qorîşmergan jî dewê:

– Tuşt. Qarê paşê tê û dewê:

– Tuşt nawi tuşt. Gerê tuştêkê bixazî! Ew jî dewê:

– Tûfê fekê min ke! Paşa va ma û go:

– Tûf kim?! Qorîşmergan:

– Ê, feqet vîya je te yexazim. Dare çûye pêş û fekê xwe vekir, paşe jî got:

– We şertekê ez tûf dekim, gerê we kes ra newêyi! Qorîşmerganê rêya xwe girt û vegeyîyaye kelê. Hîni dûr wû, san dûle kişand, wî jî gep kirina wan fam kir. Wî niha fam kir ku sa çi maran go je paşa yê wê tosta bixaze. San got:

– Qorîşmergano, îşev giştî pez yekişin yerin, kirîvî te bane te yeke û sa te ra berxekê şerjê yeke. Tu jî bêj ez tuşt naxazim, feqet dû bine min, eger dû bavêjî wer

me em nêlinî gur pêz bixwin. Gurekê le serawê pêz seqet yekinî, yêkê jî le peyê. Wî jî qewûl kir.

Kirîv bane Qurîşmergan kir û jê ra jî berxek şerjê kir, wî go:

– Ez we şertekê têm ku dûyî berxê sa min bêne bin biroşê. Kirîvi serê xwe xurand û go:

– Xa, rind e.

Wexta şîvê, dû anîne wer Qurîşmerganê, wî jî celd hilanî, çûye der û avite wer san; her çi kirîvê go mavij mavij hêfe, avit.

We şev şivan holistîyan, dîn pez tune, her çi vir da wêya gerîyan, nedîtin. Ta zuhîrê yegerîyan, vî kolûta bigerr wî zawê bigerr, tune ku tune...

Kirîvê we xwe ra go ka herime cem Qurîşmerganê, gaşe ew bizaniwi. Çûye derî mala wî, dî hînê raketîye, banê kir û got:

– Rawi Qurîşmergan rawi ku bedbext wûm, kulli pezê min kişîyaye û venda wûye. Qurîşmergan:

– Qet xefet mexwe, ez zanim le kû ye. Ta je mal verket san dûle kişand û we wî ra şûna kerîyê pêz gotin, dîsa dûle kişandin:

– Qurîşmergan, Qurîşmergan! Eger gotin çi yexazî, bê feqet du berxê cêwi mîya qemer yexazim.

Wî şivan û kirîv bire cam pêz. Kulli xwuşal wûn, we dorê Qurîşmerganê ketine tawê. Her kes tuştêk sa xelatê tanî, wî jî yego na, naxazim.

Mî yekalîn û bane Qurîşmerganê yekirin:

– Eger min hilînî sa te ra yezêm, sa te ra hezar berxan yezêm, bizin jî we wî tora. Qurîşmerganê got:

– Ez feqet du berxê mîya qemer yexazim û bes e. Her çi gotin ew kême û filan tuştê zêdetir hilîn go naxazim.

We dû salan Qurîşmergan bûye xwedîyê hezar pezê.

Rûyekê Qurîşmergan le ser nemazê, le nav tîran dewîni du mişk radû hev dekin û we hev da yene xeweran, ew jî yekeni. Jin dewîni, dewê:

– Peyî ç esaw e, tu ku qet neyekenî, niha çi wûye? Wî jî got:

– Tuşt nin e. Ema jinikê des jê nekir, des axir pê ra got:

– Ez gepkirinê heywanan fam dekim û îro sa çi kenîme.

Qurîşmergan we dû saetekê çûye dangîyê, yewînê beranek radû mîyêk yeke, mî jî je wer berîn bazdeye wî alî cûyê. Dare beran dewê:

– Ez Qurîşmergan ku nin im, we gepê jina xwe kim, tu kurri qera ne, kurri qerek rinê! Çirokê min çûye geştê, bend û bilûr le piştê, le bina guçika we xweş bê.

### 1. 6. 3. Hafîyan

Kalikek û sê qêza xwe hewû, kalikik her ro yeçûye hêzingan. Royek je wan royana ku çûye hêzingan, hêzinga xwe ku beref kir û piştî kir, kete bin ku holisti, pişt ranebû, her çi zor kir newû. Dare rabû le nav hêzingan ifkirî, dî hafîyanek girê le nav e.

Hafîyanê rû le wî kir got:

– Kalê can ez zanim ku te sê qêza xwe heye, gerê yekê biyî min, we wan bê, her kîjanê qewûl kir ferq nake, wîya jî bizan ku eger min hilnegirin te yexwim.

Kalkik jî ku tirsîyawû go:

– Eyîwi xwe tune.

Dare hafîyan je nav hêzangan kişîya û çû, kalik jî heyran, barek girantir je hêzangan pe xwe bire mal!!!

Kêlik ku ji qêzan curet nekir, vê carê ber ve alek rinê ser hilanî ku hafîyan wî newînê, hêzing ku beref kir dîsa hafîyan hat got:

– Kalik te çere kir? Wî jî go:

– Rastîyê bixazî min je keçikan curet nekir bêim. Hafîyanê go:

– Vê cara le te yebaxşînim, eger niha herî mal û newê, siwe te dayequltînim.

Kalik êvarê çûye mal, le kuncêkê rûnişt û kire hîskehîsk, qêza girê go:

– Keko can sa çi yeyîgirî? Got:

– Qêza min, îro du ro ne ku hafîyank tê yeyê gerê qêzek te min hilgirê wer ne te yexwim!!!

Keçika girê hate hilanînê, go:

– We qewrê, ku te yexwe bira bixwe, meger ez dînim hafîyanekê hilgirim!!!

Kalik pe dilek işkesti ser le çol û çîyan hilanî, gaşe je dest hafîyanê xelas biwi, ema dîsa hafîyan je asmîn u herdê le ser wî dibarî. Got:

– Te çere kir? Kêlik got: Keça min û girê go:

– Na. Hafîyanê got:

– Tuşt nake, here hînê dudi manne. Kalikê vî cara keçika xwe û ortê kişande kunc û jê ra qezîye tarîf kir, wê jî mîna xwenga xwe cewaw da. Kalik ku westîya wû je canê xwe jî têr, wê gêşê pir neçûye dûr, pe xwe ra go:

– Bira min bixwe, westîya me. Hafîyan dîsa hat got:  
– Te çere kir? Wî jî go:  
– Tuşt ,wê jî go na, yexwast le min jî xini. Hafîyanê go:  
– Here, şanse te maye, ta te nexwim. Wî jî cewaw da:  
– Ez ku zanim yî qiçikê jî dewê na. Qe niha min bixwe, min xelas ke. Hafîyanê got:

– Here, niha têr im, siwe te yexwim.  
Kalik çûye mal, ne tuşt xwar ne jî tuşt go, zû kete cila xwe û orxan kişande ser xwe û hêstir rijand.

Kuli ku raketin, keçika qiçik sa bavê xwe şîv anî, orxan je ser bavê xwe ku hilda dî bav yegirî, jê pirsî:

– Bavê min, kekocan, meger ez mirime, sa çi yegirî? çi wûye? Jê ra got le çi belayî ye, keçika dinê jî çi gotinê, wê we bavê got:

– Bavê min, çima te je evel we mi ra negot? Siwe here, bê keçika min û qiçikê gotîye ,ê'. Go:

– Kekocan, hetmen hikmetek e ku hafîyanek yexazi ayemekê hilgiri, niha jî rawe, şîva xwe bixwe, rawe!

Kalik xwuşal çûye hêzingan, çav le rê hafîyanê wû, hafîyan peyda wû. Kêlik we ken go:

– Zava, çima direng hatî, qêza min got te hildegiri. Hafîyanê jî cewaw da:  
– Here we qêza xwe bê, her wext hewa dûman wû ez tême qasidîyê.

Keçik dûr je çavê bavê xwe hêstir yerijand, dest davite dawê Xweyê ser xwe dinalî:

– Xweyê can, ez çere hafîyanekê hilgirim ...  
Hewa ku dûman wû ricif kete cana keçikê, dûman ku dirijîya goşta wê jî dirijîya. Hafîyan hat, kişîyaye xinê û deri kişand sa ku keçik netirsê, zû tûnê xwe je ser xwe avit. Keçik çarçav wû, cayîlek bûd û necîw le pêş sekinîye. Hafîyanê got:

– Metirs ez hafîyan nin im, we kes jî mewêj ku ez ayem im, rastî her wext hewa kesk wû bizan em çûnî espaw kirînê sa te ra, her wext jî hewa swîr wû em tênî şîranî işkandinê, qet netirsî, mîvana te kuli ketine tûnê mişk û maran, giştî mîna min in.

Yêk heftêk ku red wû hewa kesk wû, keçik xwuşal wû sa ki zanîwû jê ra çûne espaw kirînê, xwengan jî hey tene yekirin û yegotin:

– Bifikire wêya, yexaze biwi jina hafîyanekê, çere jî xweşal e?!

Wê jî cewaw yeya ku çere kum, min jî mîna we yekir, niha keko tunewû ...

Hewa ku swîr bû, je dûr bêli wû ku heşemek mişk û mar berve mal tên, xwengan got: – Em ku yetirsînî, je mal verdekevînî, yerinî dûr, her kînga famîlê te çûn em vegerinî mal.

Heşem tên û şîranîya bûka xwe yeşkênin û dawê xwe yegirin. Dare jî rêya xwe yegirin, yerin.

Şevê ku hafîyan têye destgirtê, xweng dewînin xwenga wan xwuşhal e, pe hev ra dewên:

– Henî ka je ser xêni bifkirinî, ka vina çi yekin? Me ta niha nebîstiyê ku ayemek bikevi hemêzê hafîyanekê!

Dare yerin je kunê ser xêni yefikirin ku, ê mar nin e, cayîlek necîw e ku her keçik we ermanê lawikek haka ye, we xwe ra yene xeweran ku çima min hilnegirt keko we min got xweli serî me bixwe ...

Pe hev nexşe yekşînin ku xwengê we torekê bixapînin û je mal verxinin, bavêjine çalekê. We ro je xwenga xwe yepirsîn, şevî çû netirsîyayî ketî hemêzî hafîyanekê, ew jî dewê lê çere kum, niha mêrê min e, gerê bikevime hemêzê, xweng jî je hev verdekevin, dewên:

– Me mexapîn, me şevî çû dî ku mêrê te hafîyan nin e û cayîlek çere wû. Wwenga qiçik jî nakevê bin, dewê:

– Na, na. Xweng jî dewên:

– Henî, ser kendewê avê bîninî, ema xwenga qiçik nare. Dewê: Mêrê min gotîye ‚je mal bê ecazeyî min qet vernekevî’ ez îşev pê ra dewêm, eger êlişt siwe henî. Dare xweng dewên:

– Tuşt nake, siwe gerê pe me bêwî ya!

Êvarê mêr zû tê, keçik jî celd wî yekşîni ortê xêni û dewê:

– Xwenga min fam kirine tu ayem î, niha jî yexazin min bêberante kin, çere kum ez? Mêrê jî got:

– -Qet xefet mexwe, ez niha yerim, le çolê bavê te yewînim, xwe pê ra nîşan deyim, pe xwenga te jî dizanim çere kum.

Lawik tûnê je ser xwe yaviji û yere cem kêlik, xwe deye naskirinê û du sandiqê tiji zêr û zîv jî xelatê wî yeke, dewê:



– Ez ku îşev jina xwe hilteyînim, yerim, tu jî eger yexazî mala te çol newi qêza xwe û rinê je mal verxin, bira herine felitîyi xelkê bikin, kalik jî gu ve gepî zavê yeke û wan je mal yeqewtîni.

Çêrokê min çûye geştê, bend û bilûr le piştê, le bina guçika we xweş bê.

## 2. NIMÛNEYÊN WÊJEYA KLASÎK Û NÛJEN

### 2. 1. Muşkil kar e karê dil, Cehferquliyê Zengeli

Xelko le min eyw megrin, muşkil kar e karê dil

Çel qeter nêr û meya, nakişînin barê dil

Je meşriq tayê le mexrib, deşewiti arê dil

Tu derya û deryaçe, xeva nake arê dil

Bêçare û aware, bêqerar im je des dil

Îro le dunyayê fanî, xar û zar im je des dil

‘Alem giştî tendurust, ez bêmar im je des dil

Işqê malê min danî, giriftar im je des dil

Je milkê xe derweder, elferar im je des dil

Xar û zar û bêqerar, gunekar im je des dil

We serê pirr meşiqet, we dilê pirr we cûş im

We cêgerê sûxte, we lefzê pirr xurûş im

Ne dunya û axiret, dayim mest û medhûş im

We nadanê bêkemal, çimanê hemaxûş im

Pabendê qowl û qerar, stuxar im je des dil

Qedrê xa ez nizamim, le nav hemtûş û heval  
Rence û zarî dekem, bêhûde eql û kemal

We qes munacat dekem, zimanê min dewi lal  
Carê aram nagirim, tune furset û mecal

Bê huqûq û bê qerîn, eşkbar im je des dil

Ser we bela we şûr im, je eyamê xizanî  
Tu xêr û behre nedî, je doranê cewanî

Dayê m bi uftadegî, bi medh û senaxanî  
Ger canê xa qurwan kem, kes qedrê mi nizanî

Bi ‘ehd û şert û pêyman, giriftar im, je des dil

Ne min bav e ne bira, ne min ser û saman e  
Ne min eql û ne min hûş, ne min dîn û îman e

Ne min sewr û ne taqet, ne min şûn û mekan e  
Le ilacê derdê min, peyda nawi derman e

Şekayetê min pîrr e, erzdar im je des dil

Mêylê min tune le ‘ilm, dayê m le ehlê saz e  
We ademê nadan ra, çerre bûme hemraz e

Cunûnê min bê hesaw, êşqê min bê endaze  
Mu’min im lakin durust, ne rûjî û nemaz e

Le dergahê Xudawend, gunehkar im je des dil

Şeva ro ez degerim, dutarê min Zekerya  
Sayîlek sergerdan im, le min nakevi qerar

Mest û medhoş dexwînim, le her hengî bulbulwar  
Je êşqê mulwarîyê, rusva bûme aşîkar

Şekayetê min pîrr e, daxdar im je des dil

Bejnê min û qeda min, hem hêykel û hem endam  
Reg we reg lê nazil bû, derd û bela je eyam

Giştê belawê duya, le du kes kirin meqam  
Evel sewa Eyob û, duvom Jeferqulî nam

Barillaha tu zanî, beladar im je des dil

Je Xudawend nida hat, ey bendeyî ser we şûr  
Le ba her namehremî, derdê dil meke zuhûr

Çerre bikem je des dil, le min nemaye hedûr  
Royeke xweş min nedî, je des wî dilî nacûr

Barillaha mubînî, giriftar im je des dil

Je des dilî ser we şûr, gulrengî min bû rencûr  
Le serê min nema huş, le çavê min nema nûr

Bejnê min bûye keman, je dilê min çû hedûr  
Jeferqulî bay daye, je des dil rahê sebûr

Ya Elî can edriknî, xar û zar im je des dil

Her çar fêslê salê çûn, royekê nebûm dilşad  
Bulbulwar le ser gulan, şeva ro dekim feryad

Bêsemer û bêbehre, ‘umrê min çûye ber bad  
Jeferqulî Zengilî, dayim dekşînî dad

Ustixar û gunehkar, bêqerar im je des dil

Ey Xaliqê bêhemta, ey nûr je te bûye nûr  
Jeferqulî bêçare, je des dil bûye mehcûr

Sewa Milwariyê ra, le wî nakevi hedûr  
Çi dil hewû le Ferhad, je Şîrînê xe bû dûr

Haware we dû yarê, elferar im je des dil

Dil şem’êke heremê, ez le dorê perwane  
Bûye xerîdarê can, kirme delî dîwane

Bejnê minî çu nêyze, tey kiribûye keman e  
Le defterê zemanê, ez kirime efsane

Nam erzê xa we kê kem, erzdar im je des dil

Ceferqulî tu bes ke, nawi hekayet tamam  
We fekê û dutarê, mebir we dû hev meqam

Durfiroşî efsûs ku, xerîdar, te kir bednam  
Des bavi dawê Xadê, hînga diyanzde îmam

Bêj Xwedêo dewînî, şermsar im je des dil (Tewehudî, 2002)

## 2. 2. Tu le malo, Elîriza Sipahî

Wextê tu le mal î dunya û le nav her çi xuşê giştê le mal in

Wextê tu le mal î

**Bî hal û dil kullê sa min xevn û xîyal in**

Wextê tu le mal î

**Ez mîna şemalê sibê berve te dewazim**

Te mîna gulan bîn dekem û ban dekeme: ez te dexazim

Wextê tu le mal î

Hîlînê du mistê te sewa destê mi şûn e

**Destê te qem û qusê je henîyê mi deşûne!**

Wextê tu le mal î

Ez nademe vî malê xweyê sade we kaxek

Le bercê te dunya je mi ra giştê pelaxek

**Bia malê me je zîv û zerê dunyê wetal bu**

Ema tu le mal bu

Bia malê dunê sa min û te xevn û xîyal bu

Ema tu le mal bu

**Rinda min e şîrîn, tu le mal bu, tu le mal bu.** (Sipahî, 2012)

## 2. 3. Gulîl<sup>3</sup>, Ismaîl Husêyînpûr

Şemalek hînikî tê bînî ermanan tîni

Şemalek çav we hêstir tê û dil we jan tîni

Ez dilkul î kezewxwîn le min hedûr nemaye

Welat şewtî bûye kiz derdê dilî mi va ye

---

<sup>3</sup> Gulîl çiyayekî bilind û tijî merx ê li Şîrvanê ye

Dil penalemîş debû le va çûlî bî bira  
Kî hîllik berinexwînê bivir avîte vira

Çavê keski vî xaka we manê kil kwîr kirin  
Merxê we bejn hay ketin hêstir le me swîr kirin

Çîya kulli we mirrûz hîn le wan veye yaxe  
Ew şûnê kirkaw merxan îro tûz e dolax e

Ba brûsk tê dilî te deke gilûk dewê jwîr  
Je wî serayi defkirî le te nami tu hedûr

Tu demînî hêstirek je çavê te le herdê  
Kê pîşê qewsê xwînî hayi bî guzare berdê

Dîsa va mîrewana dest dekşîni le ser te  
Va dilbîş dayikî xerîw dil dadeyni le wer te

Dilî wî bînê barê, bînê keskitîyê dede  
Çav we hêstir dewîjî va jî je neslê me ye

Je neslî ser le jwîran, je neslê fek we xwînan  
Je neslê çîyê aşiq, je neslê dilbirînan

Dewîm sa mi ra behar, navek min je te nebîst  
Mi dî le gûşî çavan hêstir kete wînê lîst

Go navî xwa biwîjm detirsim je vir bar kî  
Tengî xwîn û hêstiran le sîngî min we dar kî

Go le zemanê berê ez gul bûm ez gulê îl  
Hema îro miştime ne gul maye ne jî îl

Ez gulîl bûm pişti le çî sîngî mi tiji merx wû  
Keri keri pez le vir çiqe bîne û berx wû

Ez dayikê reşme le dest je xerîwî denalim  
Dwîz e laylayi dewîjim hema hîllik we tal im

Cînar rewşê min tune, kanî je hev we qar in  
Sa çî gul û gulbûte nêne malî hev narin

Kanî kulli keskê le te gulîl kê ew kire kiz?  
Dîqanê dayim we pê sa çî rêwî bûne diz?

Le bin berf û baranê delûrînî qundaxan  
Dilî te gişti ar e, ar e je dest wan daxan

Va şalî reşê şevê giran e le pîlê te  
Sa tame qet tine le sî tile kîlê te

Je va refşê gulîlê feqe jî navek maye  
Je va deryayê we neheng jî feqe tavek maye

Ro je şerman swîr bûye ya pepapey dagerya  
Hêstirê çavê gulîl îşev lî bûne derya

Xwadî sîyar wu serdar nêlim bî qûşîn bimêy  
Kîyê kwîn da serî te nêlim tu bî kwîn bimêy

Sa gulîlî xwa dîsa kuwînê îşq vedegirim  
Qeytaşî xwînî merxan je bivir hil degirim

Wan tîl u qatûzê te dîsanê sa te tînim  
Tu sîngî xwa we gul ke îlê vedegerînim (Husêynpûr, 2011)

## 2. 4. Lawê Kurmancan, *Yehya Elewîferd*

Dinya tijî tutûn e  
Dinya tijî dûlax e  
Li jûri te çîyan e  
Li jîri te qebax e

Veger vere bira min  
Rûne li ser karî xwe  
Wana derxin li xwe ke  
Kiras û şîlvarî xwe

Wa çî tîp e lixistî  
Lilo veke çavê xwe  
Te lawi kurmancan î  
Xirab neke bavê xwe

Te teze darî cayla  
Bavî te kevnedar e  
Bapîrê te kanî ye  
Dapîra te simar e

Çima ewan ji bîr bûn  
Nas nakî dapîra xwe?  
Çima li ber nagirî  
Rêçûya bapîra xwe? (Elewîferd, 2012)



## FERHENGOKA KURMANCIYA XORESANÊ

**m.** : navdêra mêza

**n.** : navdêra nêrza

### A

**aciz bûn:** jar bûn

**acûr m.:** acûr, tuxle

**acûrfiroş:** acûrfiroş

**acûrfiroşî m.:** acûrfiroşî

**aftefe, avtewe, awtewe n.:** misînê destşokê

**ah n:** nifir

**-ahê te min digire:** nifira li min dikeve

**ajnî, aşnî, melewanî m.:** avjenî

**al n., ol n., qol n.:** alî, teref

**alebilût:** alebelek

**alçix m.:** parkirina şîrê keriyekî bi qasî rêjeya pezê wî

**alguher kirin:** cih guherandin

**aliş m.:** trampe

**aliş kirin:** trampe kirin, bi hev guherandin \*\*birçiyekî ku je birçîtiyê şwîrê xwe kiriwû firûşê, yekî din hat û go: şwîrê xwe we hespê aliş nakî?

**amar m.:** embar

**anix m.:** cureyekî çêreyê ye

**ar n.:** agir

**arberdayî:** agirberdayî

**arbrûsk:** brûska ku ronî dide û li cihinan dixê

**-arbrûsk te bigire:** birûsk li te bike

**-ew arbrûsk e:** mîna jehrê jîr e

**arçen n.:** arzen

**are m.:** navber

**arsexal n.:** mezinê malê, êlê, toperê

**arşûjinik m.:** bendê ku di derzî û şûjinê re dikin

**asend:** hêsa

**aşnî m., ajnî m., melewanî m.:** avjenî, soberî

**aşkirt m.:** cureyek kêrên mezin û devpehn

**av:** av

**-ava devê wî we rê ket:** ava devê wî kişiya, av bi devê wî ket

**avîtin:** avêtin

**arrif:** awir

**arrif dan:** awir dan

**axir n.:** afir

**axû m.:** giyayekî jehrîn ê ku gava ajal dixwin, pê dimirin

**avis:** ducanî (ji bo jin û beşeke ajalan) \*\*\*- *jina te avis e? -ê, du mehîni ye*

**avcîn:** nerm û avdar

**avîtin:** avêtin

**awîjin n.:** eyarê avê yê ku ji postê karikan tê çêkirin

## B

**badî, bayî m.:** qasikeke biçûk e

**badrowe n.:** şepe

**bal m.:** bask

**balgi m.:** balîf, balgî

**bane kirin:** bang kirin, gazî kirin

**bangi m.:** zêmar, mersiye

**banke m.:** depe, vîdon

**bapîr n.:** kalik

**barijandin:** barandin \*\*\* *hêsir debarijand: hêsir dibarand*

**bavkal n.:** kalik

**bayem n.:** badem, behîv

**baydan:** mexlûb bûn

**-Real Madrîdê bay daye Barselonayê:** Barselonayê ji Real Madrîdê biriye,  
mexlûb kiriye

**bayî n.:** qasikeke biçûk e

**becî:** biyanî

**bednifir:** nifirxerab \* pişikên gerê nekujî, sa ku bednifir e  
**bela kirin, bila kirin:** belaw kirin  
**belk û baş n.:** şax û berg  
**berci, bercê**  
**-le berci:** li gorî ---îsûta swîr *le berci îsûta kesk twîjtir e*  
**berçak m.:** çînê kêlekê yên çarmedorê  
**bere n.:** behre  
**berate m.:** nîşane  
**beredûmal:** 1. peza ku li pey keriyê dimîne 2. ji hevalan mayî  
**berewûyî:** berhevbûyî, nifirek e  
**berf, weref m.:** berf  
**berfendîl m.:** şepe  
**beri m.:** kam, gêle  
**beristil m.:** kevirekî meht î ku datînin pişt sêlê da ku nanê baş nepijiyaye li ser wî  
 bipije  
**bernas:** kesê ku ji guhanê makê diya berxê nas dike  
**bernexûn:** serberjêr, berê wî berjêr bûye  
**berşo n.:** şileberf  
**bewr:** çîta, dişibihe pilingan  
**beyar, beyêr:** patron  
**beydax m.:** pêşbirka hespan  
**beydaxkirin, wezandin:** bezandin  
**beyicîn:** behecîn  
**beyn n.:** mêjî  
**bezat, bedzat:** şûm, nehs  
**bêberate:** bê nîşane, bê ser û şûn  
**bêce n.:** qurekêşî  
**bêçin kirin x:** dirûtin (giya)  
**bêje:** bibirih, zêdebirih  
**bêjiyan, bêjan:** hejandin  
**bêl, mer m.:** mer  
**bêli:** bêşik, belî  
**bêred kirin:** winda kirin, bê ser û şûn kirin

**bêrqe, bendê avê:** benda avê  
**bijêrek n.:** qelînekê ji genimî  
**bijî:** kesê ku birûyên wî himbiz in  
**bijûlî m.:** goreyên ku rasterast hatine hûnan  
**bindarîk m.:** bindarûk  
**bilûr, bilîr n.:** bilûr  
**binav m.:** erdê ku şûna wê her tim hêşîn e  
**birr n.:** gir, kol, kêrt  
**birake n.:** destebirak  
**birang n.:** birang, birayê delal  
**birbir kirin:** birbirî kirin  
**birî m.:** birî, birih  
**birin:** xalib bûn  
**bişûjin m.:** şûjin  
**bixacîk:** gûgerînek  
**bixal n.:** movik  
**biyac n.:** 1. cureyekî dara biyê ya ku çiqilên wê dadikevin 2. di bostanan de şitilên zebeş, xiyar û qire ... hwd  
**biyare m.:** di bostanan de şitilên zebeş, xiyar û qire ... hwd  
**bizdîn:** qetîn, peritîn, ji hev qetîn, pizirîn  
**bîçi, bîçik m.:** pêçî  
**-bîçika hengulûskê:** tiliya hengulûskê  
**bîn m.:** bêhn  
**-bîn daye:** bêhn li ser keftiye  
**bîne n.:** kon  
**bînecih:** koçerên ku di konan de dijîn  
**bîstin, bihîstin:** bihîstin  
**bîvilgincî:** pozxilît  
**bîvilkuş:** kesê ku kulfikên pozê wî fireh in  
**bogirî n.:** kêlek \*\*\*were bogiriyê min rûne  
**bojik m.:** palûşkên xewê  
**bost n.:** bihust  
**buxur n.:** (bi xeyna erebî): nêrehêştirê ku li ser pişta wî du hotik hene

**bûd:** gelekî baş, herî baş  
**bûm, hûm:** kund, bûm  
**bûte m.:** baq, defşe, tûm  
**bûte kirin:** kirin baq

## C

**ca dîsa:** careke din jî \*\*\* *ca dîsa here nîçîrê û sa me ra kêrgiyekê lêxin:* careke din  
here nêçîrê û ji me ra kêroşkekê lê xe  
**canega n.:** conega  
**caxe n.:** çiqilê ziravk ê hişk  
**caxebal m.:** peraş  
**-caxebal dan:** peraş dan  
**cayl:** ciwan  
**caz, kapan n.:** barê deveyê  
**celd, lez:** zû  
**cele m.:** reh, rîşe, temar  
**cemidîn, cemirîn:** cemidîn, qeşa girtin  
**ceqîlik, çeçîlik, qelîştîk m.:** qelîştîka li nava dîwaran \*\**meriv ki bêkar dewe, we*  
*qelîştîkî dîfil jî yekene:* meriv ku bêkar dibe, bi qelîştîka dîwêr jî dikene  
**cêran:** ceylan, xezal  
**cêwir:** cêwî (ji bo ajalan)  
**cêwi:** cêwî (ji bo mirovan)  
**cêya:** cuda  
**cigî cigî:** tu bidî xatirê Xwedê, tika dikim, rica dikim \*\*\* *keça delal cigî cigî were*  
*û em ji vir birevinî û henî*  
**cizirîn, çizirîn:** helîn  
**cîmcix n.:** şehê pê  
**cînar:** cîran  
**cîq n.:** çîp  
**cogan, genimok m.:** garis, lazût  
**curre:** 1. çêşîd 2. nûciwan  
**cûlge n.:** deşt

**cûm:** bi qasî cûtinekê

**-cûmî ser hev kirin:** berhev kirin û pirçiqandin

**cwît n.:** cot

## Ç

**çak:** firq

**çarqurpe:** çarhebî

**çarwend m.:** kemax, qarçik

**çarwendpan:** qalçepehn

**çaryar:** hilebaz, hoqebaz

**çatme m.:** kwînd

**çavqeliştî:** 1. bêrû 2. çavfireh

**çavzor:** çavzûr

**çavluq:** çavbeloq

**çax, quner:** qelew

**çax wûn, quner wûn:** qelew bûn

**çelpandin:** awayê vexwarina kûçikan

**çem n.:** zeft

**-çem dan:** zeft bûn

**-kete ber çemê min:** kete ber zefta min

**çemereg m.:** nexweşiyeye hêştiran e

**çermebî m.:** cureyekî dara biyê ya ku çiqilên wê dadikevin

**çepçepî m.:** çepik

**çepçepî kirin:** çepik lê xistin

**çeper n.:** sûra dorê

**çeqer:** rengê poteqalî

**çer:** nêzik, hin \*\* were çerê min: were hinda min

**çerre:** çawa

**çerê:** hember

**-le çerêyê hev in:** li hemberî hev in

**-le çerêyê xelkê xwe rût meke:** li hemberî xelqê xwe rût neke

**çexel:** zivir

**çewez n.:** giyayekî ku gêzî jî jê tê çêkirin  
**çeyîlax m.:** newala bi av, çêlaxî  
**çêle:** têjikên ajalên ku nafirin  
**çêlik:** têjikên perindeyan  
**çêrik, çûrik:** çîrok  
**çiftî n.:** şal, pantolon  
**çilçilî:** xweşsuhbet, zimanşîrîn  
**çilemîş/çiremîş kirin:** destê xwe di avê de kirin û bi tiliyên xwe lê reşandin  
**ciminde:** dirinde  
**çimilî, qurûnce n.:** quncir  
**çimilî kirin, qurûnce kirin:** quncirandin  
**çing n.:** nikil  
**çirri kirin:** qêrîn  
**çirtik n.:** lêdana du tiliyan a ku îşareta şahiyê ye  
**çinîn:** (bi çya çav): tişteke ji nav tişteke kîşandin  
**çix m.:** qamîş  
**çixe!:** kire, deher! (*ji bo qewitandina kûçikan*)  
**çiksa:** çiksayî  
**çil m.:** qûç (qûçê ku di nava mêrg û zeviyan de dijenin da ku kesek pezê xwe bernedê)  
**çîn n.:** (bi (ç/ya /çav/î) moçikê xalîçeyan  
**çîne kirin:** likijîn, çêrîn (ji bo perindeyan)  
**çivçiv kirin:** çiveçiv/vîçevîç kirin  
**çîze m.:** piçek ava ku ji çilkê kêmtir e \*\*\*wêya here, bira çîze le feran nekeve:  
wêde here, bila çilkok li feran nekevin  
**çîzebaran n.:** çilkebaran  
**çodar:** celewkar  
**çomelek m.:** nexweşiyeye perindeyan e  
**çomirt, çeç:** kesê ku dest û piyên wî diricifin û karekî nabe sêrî  
**çozme:** nanekî ku di nava rûn de tê pijandin û li gorî xwestekê şekir jî bi ser de tê reşandin  
**çukurî m.:** giyayekî ku reh û rîşalên wî sor in û ji bo sorkirin û xurtkirina postê bikaranîn, li erdên hişk hêşîn dibe

**çuluq:** goc, kop  
**çumme:** lêvtotik  
**çundî m.:** qulefîsk (werziş)  
**çuneçune:** parçeparçe, hûrhûrî  
**çuqur n.:** çala biçûk  
**çurt n.:** qerçûmek, qermîçek  
**çûçik:** cûcîk  
**çûk n.:** dareke berk e û zû bi zû naşkê  
**çûlçûlî:** qilqilok, kesê ku diçe û tê, di cihê xwe de nikare bisekine

## D

**dabizdiyan:** ji hev qetîn  
**daçayan:** helîn *\*\*berfa ser xêni daçiya, niha xanî dilop deke*  
**dade:** bigire (ji bo kûçikan)  
**dadin:** dayîn  
**daf m.:** tele  
**dalan m.:** şaneşîn  
**dande:** golika du salî  
**dangî m.:** sûra dora malê  
**dan kirin:** dew rijandin û rûn girtin  
**daqultandin:** daqurtandin  
**dare:** paşê; *\*tu herî mal, dare çi bikî?*  
**darmîzik, dartawî:** cureyekî darên ku di baweriya gel de pêşiyê li nezerê digire û  
 pîroz e; lewre wê naşewitînin  
**darqîzik:** dareke ku di baweriya gel de şewitandina wê bêyom e  
**dax m.:** 1. kel 2. birîna şewatê  
**-daxa te biwînim:** *tu bimirî û daxa mirina te bide dilê min!*  
**day m.:** sewax *\*\*\*dayê vî dîfalî le berci dîfalê mala we qalingtir e*  
**dayewendin:** tepisandin *\*\*dirav dayewend cêba xwe*  
**dele:** 1. sîmore 2. navmalagerî  
**delengaz:** maliqî, xwarbûyî û nêzikî ketinê  
**delmek:** cureyekî mêşezêrên ku jehra wan tîr e



**dene m.:** dendik  
**derax m.:** xiştê ku pê tevnê dikutin  
**derçe n.:** pencereya biçûk, wekî yên destşokan  
**dergîstî, destgirtî:** destgirtî  
**derpe, derpi n.:** derpê  
**derxûn m.:** devikê biroşê \*\*\* *biroş degere û derxûna xwe diwîne*  
**dest jê kirin:** dev jê berdan \*\*\**dest je mi ke, ez îflah nabim*  
**destunik:** desteng  
**deve:** hêştir  
**dewe:** dibe  
**dewe-nawe:** dibe-nabe  
**dewirandin:** rê ve birin  
**dewrî I m.:** çehre  
**dewrî II n.:** qasik  
**deyax m.:** tehemul  
**deyîre m.:** defik  
**dêxistin:** daxistin  
**dêze n.:** کنار  
**didan, diyan n.:** diran  
**didankeftî:** diranketî  
**dilwedat:** dilbidax  
**dilwer:** dilber  
**dirav n.:** pere  
**dirêdir n.:** dengê ku merivê lerizî derdixe  
**dirêj, dirîj:** dirêj  
**diriyan:** bizdiyan: diriyan  
**dirîv n.:** durûv, duruf  
**dirodîn:** merivê ku ji ber hinek xisletên wî yên taybet dîn tê hesaibandin; zirdîn  
**dîfal n.:** dîwar  
**dîsa, dîsan:** dîsan  
**dîtman, dotmam m.:** dotmam  
**dîwek n.:** cûnî  
**dol n.:** satil, vêdrok

**dolanek n.:** far. Zalzalek  
**dor m.:** çivangeh  
**-dor lê xistin:** jê averê bûn, ji rê veqetîn û ketin çivangehê  
**dundî:** moz, mêşezêr  
**duqurpe:** bi awayekî derasayî hebûna du tiştan bi hev ve, wekî hêka duzerdik û mirovê duserî (ji bo hemû tiştên bigiyan û bêgiyan)  
**durî n.:** tûteke biyanî ye  
**durrî n.:** dirih, dirî  
**duşeng:** şaşwaz, mehtel  
**duşeng bûn:** mehtel man  
**dûlax m.:** bayê bi toz û xubar  
**dûlan m.:** çem û mij  
**dûleba m.:** bablîsok, babelîsk  
**dûlgan n.:** cureyek teşiyên herêmê  
**dûw n.:** dûv  
**dwîn n.:** don  
**dwînik:** donik, rûnî  
**dwîtin:** dotin

## E

**ecûze:** acûs, kirêt  
**eko n.:** keko  
**elaw m.:** alaf  
**endaw m.:** sewax  
**endaw kirin:** sewax kirin  
**engez m.:** hestiyên çengeyê yên ku diranên axiriyê tê de şîn bûne  
**enkelaz, kilkilaz:** belawela, pejmûrde  
**ereq n.:** mey, araq  
**erîw:** xwar  
**erman n.:** armanc, xwezî  
**ervane, erwane m.:** hêştira mê ya pîr  
**erwan n.:** armanc, xwezî

**eskenas n.:** pereyê kaxezîn  
**ewravî:** ewrê ku baranê tîne  
**eweng kirin:** di odeyeke sar de ewzankirina mêweyan da ku xera nebe  
**ewzan kirin:** daliqandin, hilawestin  
**eyas m.:** hewayaya sar û bêewr  
**eyreg m.:** hewldan, qeyret

## Ê

**êgince n.:** cureyekî nanê ku dişibihe borekan, di nava wê de goşt an jî sewzî heye  
û di rûn de tê qijirandin  
**êlek m.:** bêjing  
**êlifte:** fêlbaz, hîlebaz  
**êliştin:** hiştin  
**êmîş, qêmîş kirin:** qêmîş kirin  
**êxal kirin:** ji ber hewayaya ewrawî tarî bûn  
**êzne, zava n.:** zava

## F

**falik m.:** hêka ku li cihekî tê danîn ji bo perinde hîn bibe û li wir hêk bike  
**fam/halî:** fehm  
**fatik m.:** faterişk  
**fekçepel:** devçepel  
**fekdol:** devsatil, devberoş, devmezin  
**fekegirêz:** devgilêz  
**ferandalês m.:** tiliya şehadetê  
**ferd:** cuda, ferq \*\*\*nav malê da Hes je yê dinê ferd e  
**fere:** fireh  
**fikir, bifikir, temaş ke, gilê ke:** binêre, mêze ke  
**fernîç m.:** qada ku di bin darê de ye, bindarûk  
**fênd m.:** fend  
**firêt m.:** firêt (tayê ku bi dirêjahî hatiye ziyîn)

**fîş kirin:** xilîta pozî paqij kirin  
**fîşî:** çilmo  
**fîsek:** suhatî, xeydok  
**fîs kirin:** suh hatin  
**fîtik m.:** fîq  
**fûte n.:** pirtî, parçeyek qumaş

## G

**galîk n.:** koxik  
**gal:** cureyekî pîrhevokên ku tevnan çênakin û di bin erdê de kunan çêdikin  
**gan n.:** guhan  
**gapêr:** degme (bi /p/ya /pirç/ê) *\*\*na her tim nayê, gapêrekê têm*  
**geprûk m.:** goştê di bin çengeyê de  
**garis n.:** kuncî  
**gaşe, gawşe:** dibe ku, ihtimal heye ku *\*\* gaşe hesen sibê nêwe (dibe ku hesen sibehê neyê)*  
**gelzik m.:** qesetûre  
**genek:** gir  
**gere:** gotî, divê  
**gerendoz, hilgerdîn:** hawî, axozî, navmalagerî  
**geriş, geliş n.:** bext, şans  
**gew, gewer n.:** erdê rast ê di navbera du kêrtan de  
**gewisîn m.:** qirpika bêhngenî  
**gewri m.:** gewrî  
**gewşek:** devgilêz  
**gez n.:** darek e ku belçên wê derzîkî ne  
**gicî gicî:** tu bidî xatirê Xwedê, tika dikim, rica dikim  
**ginceginc n.:** teqereq û çûn-hatin  
**gincgincî, cûya:** geriyayî  
**girav m.:** gerew, rehîn  
**girek n., gîl n., lûş m.:** herî  
**girêz n.:** gilêz

**girmîşk m.:** hebên mezin, parçeyên mezin  
**girnok m.:** gurnûk  
**gildîgildî:** rewşa tiştê ku daliqiye û ba dibe  
**gilor:** gilover  
**giyan m., can n.:** can, giyan  
**gîzik, gwîzik n.:** gûzek  
**gor m.:** kom  
**-gorî dora hev bûn:** komî dora hev bûn  
**gorewend m.:** xemleke ku diavêjin stûyên hêştiran  
**gorik n.:** pezav, bizav  
**-gorikê xwe kişandin:** pezav dan xwe, bizav dan xwe  
**goriyan:** gurandin ez ê te mîna pêz bigorim, wî pez gorand  
**guçik n.:** guh  
**guçik dan:** guh dan  
**guder:** rehma jinê  
**-le guderê maye:** nivê zarokî hatiye û nivê din hê maye \*\* *sebr ke, guderê maye*  
**gufişandin:** guvaştin  
**gulavgerdîş, gulufgerdîş m.:** berroj  
**gula bûk û zavê, qaçe:** cureyekî gulên ku serê biharê şîn dibe û dişibihe zebeşan,  
**gula caniyê:** guleke ku dişibihe binefşê û di zeviya genimî de hêşîn dibe  
**gulbaxî m.:** gulesora ku jê gulavê çêdikin  
**gulebûk, gula bûk û zavê, qaçe m.:** gulebûk  
**guleqelî m.:** cureyekî gulên belgspî ye, hişk dikan û tevî devgermê dikan  
**gulerwan m.** cureyekî gulan e  
**guli m.:** gulî  
**gulpitik m.:** gulek e  
**gumiz n.:** kulm, boks  
**gumizî:** 1. werzişa boksê 2. balûre, hop  
**gumizî kirin:** boks lîstin  
**gun m.:** hêlik  
**-gun kişandin:** 1. hêlik kişandin, xesandin 2. bêtevger kirin, bêdeng kirin  
**guntêcan:** kesê ku gunên wî ji ber nexweşiyekê mezin dibin, diqermişin û dadikevin jêr

**gup m.:** gep  
**gurde n.:** wêrekî, cesaret  
**gurde kirin:** wêrîn, cesaret kirin  
**guri:** gurî 8,\* guri guri, kûn bidiri  
**gurîf m.:** 1. gulok 2. quraf  
**gursegurs m.:** avêtina dil, dengê dil  
**gurum n.:** peyn  
**guwer/gawer n.:** keriyê dewêr  
**gûbeq m.:** kevz  
**gûnî, gwînî n.:** gûnî

## H

**ha bûn, ho bûn, hêvisîn:** hîn bûn  
**hafiyân:** cureyek marên mezin  
**halî kirin:** fehm kirin  
**haşamîş:** qure  
**haşamîştî m.:** quretî  
**heçe n.:** heçî  
**hedûr m.:** sebr  
**hefşan m., mere m.:** hewşan  
**helebend:** çareseriya nexurt \*\*destê xwe nedê ew helebend e  
**helebend kirin:** ji bo demeke kin çareser kirin  
**hember:** 1. m. pêber 2. du zarok an jî têjikên ku şîrê berekî mêtine  
**hemilandin:** tehemul kirin  
**hemqed:** di bejnê de bi qasî hev  
**hemrû:** rûyên ber bi hev  
**hemtûş:** hemtemen, dost û hogir  
**hendehûn kirin:** xeraw kirin, tev rakirin, serobino kirin,  
**hendirûn m.:** hundir  
**heng n.:** stran  
**hengaw:** zor \*\*\* hengawa xwe nede ser şûşeyê, wê dişkê  
**hengulûsk m.:** gustîl

**henî:** 1. *m.* enî 2. were em biçin  
**henîşk:** enîşk  
**heray m.:** hawar  
**heray kirin:** hawarî kirin/xwestin  
**herd, erd n.:** erd  
**heşaw kirin:** tev rakirin, tev dan  
**heşem m.:** gelek, kom  
**-heşemek mişk û mar berve mal tîn:** komek mişk û mar ber bi mal tîn  
**hetan m.:** miyarê pîvandîne, mîhenga pîvandina dirêjahiyê  
**-hetan kutan:** sing kutan, parsel kirin  
**hevalxizan m.:** hevalbiçûk  
**hevirmîş n.:** hewirmûş  
**hevîrxûn m.:** sifreya ku hêvîr dinixume, hevîrnixêm  
**hevo m.:** tayê ku bi berahî hatiye raçandin, dijbera firêtê  
**hevorî, nîrî n.:** nêrê bizinê  
**hevrîng m.:** hevbirîng, hebrîng  
**hewan m.:** di kefkaniyî de dewsa kêvir a ku çermîn e  
**-guçik bûne mîna hewanan:** guh bûne mîna çermehişkî  
**hewançekan m.:** giyayekî mîna gizêrê ye û bi kêrî dermankirina perç û wermê tê bikaranîn  
**heypiya:** li ser hev \*\*\**heypiya dibêjî lê guçikê min ne le te ye*  
**hezaz m.:** hezge, hejeka ku cihê xwe leqiyaye  
**hezizîn:** xumarî bûn  
**hêcandin:** hejandin  
**hêl m.:** gun  
**-hêl û gun:** hêlik û batî  
**hêlanek m.:** hêleçan  
**hêrî m.:** di çiyê de cihê di navbera lûtke û quntarê de, \*\*\**pez kişiya hêriyê*  
**hêrijandin, hazirandin:** hincirandin, cureyek acizkirinê, westandin  
**hêrijîn:** hincirîn  
**herî m.:** hirî  
**hêrandin:** hêran  
**hêrûk:** dînok, kesê ku dikeve alemeke din, bi xwe re diavive û dikene

**hêstir:** hêsir  
**hêşin:** hêşîn  
**hêvalek m.:** gêzî  
**hêzing, êzing m.:** êzing  
**hilanîn:** wergirtin  
**hilbezdîn:** vehundirîn ser xwe  
**hilçinîn:** tertîb kirin  
**hildan:** rakirin hewa  
**hilfiriyan:** êriş kirin  
**hilgirtin:** wergirtin  
**hilistin/hildiaste/hiliste/hilo:** (ji cihê xwe) rabûn  
**hilimsîn:** rakirin (soran)  
**hilm:** 1. n. adet 2. m. însaf  
**hilqîşteşek:** navmalagerî  
**hingiftin:** bi xwestek li tişteşekî nihêrîn  
**hilistin/hildiaste/hiliste/hilo:** (ji cihê xwe) rabûn  
**hirik m.:** rûnê nivîşk ê ku piştî kiyane li ser dêw dimîne  
**hirm m.:** hirmê  
**hirmîç:** diya bêşîr an jî kêşîr  
**hişkilok:** hişkelok  
**hîllî n.:** awêne, neynik  
**hîmenî n.:** zinar \*\*mîna hîmeniyekî kete pêşiya min  
**hîne, hela:** hê, hîn  
**hîng m., dare m.:** dem, zeman  
**hînga:** wê hingê  
**hîtîmçe:** kesê ku çî bê ser pelê wî dike  
**hîz:** tirsonek  
**holemîş bûn:** (ji bo birîna şewatê) zêde bûn  
**holiştek n.:** kîkil  
**horzelik, orzelik m.:** ûzelik  
**hûçik m./n.:** huçik  
**hûçikswîr:** 1. zengîn 2. piştixurt  
**hûphûp:** hudhud



**hûşt:** piş (dengek)

**hûştikîn:** aqilsivik

**hûv, hov:** hov

## I-Î

**iniyan:** niyan, nayîn

**ispartin:** spartin, emanet kirin

**isping m.:** sping

**ispîk m.:** spîk

**îllerî:** zimanbaz

## J

**jeniya:** qethen, tu car, dîsa

**jin kirin:** jinek ji xwe re xwestin

**ji xwe çûn:** ji xwe ve çûn, ji ser hişê xwe çûn

**juni m.:** çok

**jûjî:** jûjî, jîjo

## K

**kac m.:** dareke derzîkî ye

**kaçe:** mirovê ku zû tê xapandin; kaçê

**kakirtîk n.:** kirtkirtîk

**kal n.:** qire

**kalan n.:** (bi /k/ya /kort/ê) kalanê şûrî

**karî:** giran, kûr

**kaşîk m.:** pêlîstok

**kaw n.:** kap

**keçe n.:** lîstika têderxistinokê (tişteke di destekê de tê veşartin û tê pirsîn bê ka di kîjan destî de ye)

**keçe kirin:** keçe lîstin

**keçilok:** gemarî  
**keçilok wûn:** gemarî bûn  
**keçûlek m.:** nexweşiyeye kûçikan e ku goc û kop dike  
**keftekeft n.:** kewtekewt  
**kekacî n.:** kek hacî  
**kele n.:** gund  
**kelegî:** gundî  
**kelem m.:** çirpî, kelem  
**kelewan:** aşvan  
**kelexwih m.:** xwidana sar  
**kelê m.:** kêlî \*\*\*kelêkê were ba min  
**kelme m.:** (bi /k/ya /kiras/î): tiştê bêbiha \*\*were, *henî mala me, tuşt tune, kelmemalek me heye*  
**kelmîz:** kelmîzok  
**kelpase, qumqumik:** gumgumok  
**kema m.:** dareke hişk û xweşbîn  
**kemişîn:** xwe telandin û kemîn avêtin  
**kendewe n.:** n. cihoka avê  
**kendê (kî hendê):** kî derê, kuderê  
**kenîndar:** pêkenok, komîk  
**kepir n.:** (bi /k/ya /kiras/î û /p/ya /pirç/ê): şorik, erdê ku şorgeh e  
**-kepir girêdan:** (ji bo erdê şorik) xwê girtin  
**ker:** peza guhbiçûk  
**kerexş m.:** tevz \*\*\*kerexşa destê min kişiya  
**kerexş bûn, kirin:** tevizîn, tevizandin  
**keri n.:** kerî  
**kêrî I n.:** her du darên meşkê  
**kêrî II m.:** (kirpandin li ser kyê) kemîn, tele, dafik, daf  
**kesêw m., sersût m.:** arkolok  
**keşka:** xwezila  
**keçemar:** cureyekî marên sîngpan e, semboleke misriyan e jî  
**kevin m.:** destmala seriyê jinan  
**kevirbarîn m.:** nişenaye mehtelmanê

**kevirî:** ji kevirî \*\*ev fera kevirî ye  
**kewçi, kewçi m.:** kewçî, kewçik  
**keweg n.:** darê riziyayî yê ku nava wê qul e  
**kex, kal:** negihîştî  
**keywanî m.:** kebanî, kewanî  
**kêlek hate girtinê:** ji kêlekê girtin  
**kêrgî:** kêrguh, kêvrîşk  
**kimirte:** mêweyên negihîştî yên ku tên xwarin wekî alû, zerdalû  
**kindir kirin:** revîn (bi zimanê zarokan)  
**kiras m./n.:** qutik, îşlik  
**kişîn:** bilind bûn (giya)  
**kir:** bizina guhbiçûk  
**kirkaw m.:** dareke ku baş vêdikeve, xurt û ne gelekî dirêj e  
**kirt n.:** navbera du çiyayên bi hev ve  
**kirtik n.:** kirtkirtîk  
**kişte n.:** qax  
**kiyal m.:** zevî  
**kiyan:** kilandin  
**kizik n.:** donê dûvî yê ku tê kizirandin  
**kizî m.:** di qirikê de cihê ku av tê de bimîne mirov pê dikuxe  
**kîl n.:** kuçik  
**kîn I n.:** hotika li ser piştê nêrehêştirî  
**kîn II m.:** kon  
**kîvî:** kûvî  
**kod m.:** 1. eyarê goşt an jî avê 2. derdanka ji axê ya ku ceh, genim û hwd dikinê 3.  
 ji giyayê golikê dihat çêkirin û wekî de  
**kole:** tûleyê berazan  
**kolik m.:** şimika devgirtî ya ku tilî tê de xuya nakin  
**komac m.:** cureyekî nên e  
**kot kirin:** qûç kirin  
**kurç m.:** kurik  
**kurç bûn:** ketin kurikê  
**kufik m.:** 1. kefik, efûng 2. xeleqa dora tawûtê

**kufkarik m.:** kûvark, karî  
**kuh n.:** xerêfa çavan  
**kuh kirin:** hûf kirin (pifkirina ji bo germkirinê)  
**kul I m.:** cil û berg \*xwengek min î kulemexmel (sincîd)  
**kull II:** kol, bêşax  
**kulav, kilav:** kulav  
**kulçe n.:** kulîçe, cureyekî kadeyan e  
**kuligir:** kuliyên berfê yên gir  
**kulinc m.:** nanê ku ji dîwarê tendûrê dikeve nava êgir  
**kulişt n.:** kerdiya darê  
**kund, hûm, bûm:** (kirpandin li ser /d/yê ye): kund, bûm  
**kundirîşk m.:** 1. şîlana hişkkirî 2. mêweyê dara şîlanê  
**kundûk m.:** metere  
**kunkunîşk kirin:** qulqulî kirin  
**kunîk:** kulî, hespê pîrê  
**-çavkunîk:** çavbiçûk  
**kunîr m.:** kunêr  
**kunîşk m.:** qulên biçûk  
**kur I:** kurt  
**kur II:** dûvbiçûk  
**kuras, kiras m./n.:** îşlik  
**kurebeş:** qurebeşk  
**kurm I m./n.:** kulm  
**kurm II:** kurm  
**-kurmê fisek:** kurmekî biçûk î ku doça pê dikeve û roniyeye lawaz dide dora xwe  
**kurmîck:** qincilî  
**kurtûk m.:** şepe  
**kuşik m.:** kulfikên bêfilê  
**kuşin m.:** xîret, xurûr; hewldan  
**kûçî:** (bi /k/ya /kurt/ê) tûle  
**kûn m./n.:** qûn  
**-kûnî çavê:** qulpa çêhv  
**kûnd m.:** (kirpandin li ser /û/yê ye) gilfika hevîrî

**kûnfere:** 1. qûnfireh 2. teral

**kûnmit/qûnmit:** (bi /k/ya /kirin/ê) kesê ku qûna wî bi derve ve loq disekine

**kûntipik:** kûnmit

**kûp kirin:** deverûyî kirin

**kûrebuxsî m.:** hilm û gilma ku ji erdê radibe

**kûredûman m.:** dûmana tîr

**kûtel, kotel m.:** hevraz

**kûtî:** nebaş, nerind

**kûşkûr, kuşkûr m.:** silê dewaran ên hişk

**kwînd m./n.:** kon

## L

**la:** lo (dûr)

**laçîn:** şahînê spî

**le ba ye (li ba ye):** berba ye

**lentî m.:** matoşqe, orispî

**leq m.:** ling

**lexe m.:** beleban, zinar

**leylan m.:** 1. serab 2. xûsî

**lê m.:** lehî

**lêvçor:** devlopik

**lêv dan:** lêva xwe daxistin

**lêvkaşik:** lêvkihêl, xwemetah

**lêmişt m.:** 1. lehî, lêkend 2. lê miştiye

**lêvzotik:** lêva zûtikê

**livandin:** leqandin

**lîk n.:** xilît

**lîlik m.:** alagoşk

**lîwan I m.:** îskan

**lîwan II n.:** devgem

**lok n.:** nêrê hêştirê

**lokçe n:** nêrêhêştirê ciwan

**lona:** filanî – lona go: Hes çûye mala Mesê.  
**lotik m.:** çift, refes  
**luke n.:** tîkeyê mezin *\*\*vereşiya, kezewa wî luke luke wû*  
**lupiq n.:** fitik  
**lûç, rût, tazi:** tazî  
**lûf:** (ji bo maran) xwe civandin hev, kovelan  
**-mar lûf dexwe:** mar xwe kovelan dike  
**lûşî m.:** alûçe:  
**lût:** terixî, mêwe û sewzeyaya ku pir gihiştiye û êdî divirçiqe

## M

**maçe m.:** kera mê  
**makarçîn m.:** beraza mê  
**mal û minal:** zar û zêç  
**marzûk m.:** hestiyê piştê  
**max m.:** sîwana ku li kon tê zêdekirin  
**mazbilûr m.:** şambelot  
**mecî n.:** hêştira mê ya ciwan  
**meçît m.:** mescid  
**medgîr m.:** darê ku pê cotkirina gîsn eyer dikin; maça cotî *\*\*\* bavê min le paş*  
*medgîrê sekinîbû û zemîn şîyar dikir*  
**mejme m.:** siniya hera mezin  
**mele n.:** hespê zer  
**merx m.:** dara merxê ya ku dişibihe serwê  
**merz I m.:** erd  
**merz II n.:** tixûb  
**meske m.:** rûnê nivîşk  
**mexû:** kesê bêkêr  
**meya kirin:** meyandin  
**mezinûk m.:** ber kulêmekê, ber mûyê heram  
**mêji n.:** mêjî *\*\*\* ket, mêji le herdê rijiya*  
**mêşin, mîşin m.:** mî

**mida, miya m.:** niyet, daxwaz \*\*\* mida le ser dilê min ma: *hesret di dilê min de ma*

**milikî:** sergirêdana qîzanî

**minê:** gelo

**minminîk, bilbilîk:** perperok

**mirûz dan:** xwe mirûz kirin

**mist dan:** mizdan

**mişkê duling:** koremişk, xilt

**miştin:** maliştin

**mîç:** nîşaneyê jarbûnê ya ku gep digihêjin hev

**mîrî, mîrçe:** morî, mûstang

**mîtin, mijyan :** mêtin û mijîn

**mîzan m.:** payîzê yeksaniya şev û rojê

**moj m.:** amojin

**mormorîk:** çîkeagirên biçûk

**moze:** engirî

**-xwe moze kirin:** engirîn

**mûxik:** kurmê nav hiriyê

## N

**nal m.:** newal

**nalciq m.:** bivirê cengê

**nalî m.:** doşek

**nata:** nota, mîna

**natê, mîna, nala:** notlê, nola

**natiye:** nehatiye

**nava leqan:** nava şeqan

**navşikil m.:** 1. navçav 2. sîma

**naw n.:** kurnê avê

**neqiçî:** qirtî, hîlebazî

**neqiçî kirin:** qirtî kirin, hîlebazî kirin

**nerd :** cureyek kurmên ku çermê heywanan qul dike û derbasî nav goşt dibe

**nerdiwan m.:** pêlekan  
**nevçe m.:** bişkoyê darê  
**newaşe, negaşe:** Xwedê neke; -neweşe ku îşev baran bibare  
**nîçîr m.:** nêçîr  
**nîmdar:** kevn  
**nînik m.:** neynûk, nînok  
**nînikgoşt bûn:** neynûk di goşt de çikiyan  
**nuxit n.:** nok  
**nûke:** niha  
**nûsikandin:** zeliqandin

## O

**ogît m.:** şîret  
**ol, al n.:** alî  
**oleng m./n.:** çîmen  
**orik m.:** bendê ku pê lingên ker û hespan girêdin  
**orik kirin:** ling girêdan \*\*\* ji viya zêdetir gep meke, ku le vir te orik nekim  
**orinçe m.:** once  
**orînag m.:** nimûne  
**ortebihar m.:** nîveka biharê  
**orte m.:** navber, nîvek  
**oxşer:** minasib  
**owe n.:** obe

## P

**pa:** hişyar \*\*tu raketiyê yan pa yî  
**paç n.:** pîne  
**palî m.:** kêlek, cem  
**pari n.:** parî  
**pardimî:** bendê ku ji zîn yan jî ji kurtanî tên û di bin doça ker û hespan re derbas dibin



**parêz m.:** perhîz  
**parparîn:** qarqarok  
**parsi, parsû m.:** parsî  
**parzin n.:** parzûn  
**patin:** pehtin  
**paşero:** pişt li royê  
**paşerê/paşepê:** paşepêl  
**paxûn kirin:** 1. pirçiqandin 2. mafê yekî xwarin  
**pelçiqandin:** pirçiqandin  
**pelipan m.:** pêlekan  
**pelwerî kirin:** bîse kirin  
**pem, pemî, qunde :** pembû  
**perçiyê kirin:** bîzê xwe ji tişteki kirin, dilê xwe li hev xistin  
**perçiyê bûn:** bîzê yekî jê hatin, dilê yekî pê li hev ketin  
**perî:** (bi /p/ya /pari/yê) odeya ku ji bo bûka nû di nava malê de ji qumaşî tê çêkirin  
**permûçikîn:** rûçikîn  
**pert:** 1. bêkêr 2. bêleqe  
**pert kirin:** avêtin  
**pervaz, perwaz m.:** birîn û qutkirina darên xam tebeqe bi tebeqe; kereste  
**perxav m.:** sîloya gênim  
**pesav m.:** biyaban, çol  
**pey n., pî m.:** pî  
**peywanî m.:** qîjîn û hêwirzeyê ku ji bo revandina berazan dikin  
**pêq n.:** geh, teşk  
**pêşaw m.:** mîz (zimanê kubariyê)  
**pêşil û paşil m.:** pêşa jorîn û ya jêrîn  
**pêtav n.:** pêbend  
**piçî piçî:** parçeparçeyî kirin  
**pidi, pidî m.:** pidî, pirî  
**pifik, pifle, pufle m.:** peqpeqka piştî şewatê  
**pijiqîn:** qetiyan  
**-ji hev pijiqîn:** ji hev qetiyan  
**pinandin, pirandin:** rakişandin, lêdan

**pind m.:** sil, silepor  
**pindûk, pînik m.:** koxê mirîşkan  
**pirç û pal:** gildîna nava malê  
**pirik (ê berfê) n.:** kulî  
**pirkar:** hîlebaz  
**pirtiwandîn:** (bi aviyekê) şewitîn  
**pismam n.:** kurap  
**pisxaltî n.:** kurxatî  
**pişik, pişîk :** pişik  
**pitik n.:** tepeke biçûk  
**pitepiz, lêvquz:** lêvdoran  
**pizandin:** xemilandin (wateyeke neyînî tê de heye)  
**pizûk m.:** pizik  
**pîken m.:** xepar; amûra aşêfkirinê, kaxkirinê  
**pî kirin:** aşêf kirin, kax kirin  
**pîn m.:** pehîn  
**pîremexur:** kesayetekî efsaneyî yê ku zarokan pê ditirsînin, wekî gurê manco  
**pîşîn, zuhîr n.:** nîvro  
**pîştora m.:** şaneşîn  
**pîzik m.:** pîpik  
**pof n.:** kûtê segan  
**pozgur:** darê ku di tevnê de ji gurgê ziravtir e tê kaşkirin û berdan  
**puf kirin:** pif kirin (ji bo sarkirinê)  
**pufle n.:** peqpeqokên ji ber şewatê

## Q

**qaç, qaş n.:** tîlam, parçe  
**qaf m.:** qaqotk  
**qaling, qalind:** stûr, qalind  
**qamçî n.:** qamçî  
**qançirê girtin:** (hesp) nexweş ketin û li ser xwe nesekinîn  
**qang m.:** nexweşiya ku mirov nikaribe piştta xwe rast bike

**qanîk n.:** kefkanî  
**qaqirçîk m.:** xurtxurtûk  
**qaqizîk m.:** şîrdan, cureyekî pîvazên biyanî ye ku şîrîn e  
**qarş n.:** hember \*\*\* *le qarşê min sekiniye*  
**qaşmar:** qeşmer  
**qawan n.:** berazê nêr ê ku girs e, tenê digere û bi tevî keriyê berazan nabe  
**qefçîl:** gemarî, qirêj  
**qeftal m.:** kêlek  
**qelişte:** qelişî  
**qeliştîn:** qelişîn \*\*\* paniya wî qeliştiye  
**qelûr m.:** 1. bêjing , 2. sefînek  
**qemç n.:** baq, defşe  
**qemçe m.:** deste, defşe  
**-qemç kirin:** 1. kirin defşe 2. ji dêst revandin  
**qemirçî, qermiçî:** qermiçî, qerçûmekî  
**qeremîx m.:** cureyekî daran e, qermax  
**qereqîrç, qiliqîç n.:** serwerê keriyê berazan  
**qerentû:** qeretû  
**qeresîn:** qerisîn  
**qerqeşûm m.:** qerqeşûn, risas  
**qeter m.:** rêz \*\*\**qeterê bisekinin, di rêzê de rawestin*  
**qets m.:** payîz  
**qewax m.:** şkeft  
**qewsîng n.:** sersîng  
**qiçik:** biçûk  
**qijdî:** 1. tejê riziyayî 2. tiştê şewitî û reş bûyî 3. mecaz qeretû  
**qijilandin:** kizirandina mûyî  
**qijqijik n.:** barija berfê  
**qilç m.:** tîke  
**qileqîç:** kesê ku diranê wî yê pêşîn kelevajî ye û derketiye pêş  
**qilew:** erdê bi çal û kort, bi kort û kêrt  
**qilik m.:** qilîçank  
**-diya qilikê:** tiliya gustîlê

**qilîf m.:** qasika bi devik  
**qilqilî:** kesê anoş, laloş  
**qilyan n.:** hespê baran  
**qincîr, quncîl:** qincilî  
**qingir:** kesê ku çavekî xwe digire û bi çavê din dinêre  
**qireswîrik m.:** qirş û qal, pirç û pal  
**qirik:** qijika belek  
**qirî qirî:** qidî qidî, gidî gidî  
**qirpe:** sergirêdana misilmankî  
**qirtik m.:** qirik  
**qiyax m.:** giyayekî dişibihe gênim î û bi dasî ye  
**qizirme m.:** ta, humma  
**qîmsiz, kîrnîs:** timakar, çikûs  
**qîrîn:** qêrîn  
**qîspik, xîspik m.:** qirpika ku bi vexwarina avê derbas dibe  
**-qîspik/xîspik rabûn:** qirpik hatin  
**qîwe:** cureyek rişkên mezin  
**qola:** heywana doçkurt  
**qoleqol kirin:** gotegot kirin  
**qoncik m.:** çiqilê hişk  
**qor m.:** ref \*\*\**xwe je qoran nêlişt û wî kire qurequr: ji hevalan paş ve nema û wî jî suhbet kir*  
**qoşwan:** baxçevan  
**qoşwanî m.:** baxçevanî  
**qul, qol m.:** alî  
**qule kirin:** birîn, qut kirin  
**qulime:** kesê ku xwe zorbe nîşan dide  
**qulîq, qulix n.:** guh  
**qulpêç kirin:** pê avêtin ber yekî \*\*\* *te ez qulpêç kirim, ketim û serê min işkest*  
**qulum, qulup, qurt m.:** qurt  
**qumar m.:** pêçeka dora zaroka viringî  
**qumar kirin:** zarok pêçan  
**qunde m.:** pembû

**quner bûn:** qelew bûn

**quntoz n.:** gulik

**qupilîk m.:** toptopîka serê çêreyê

**qupiz:** 1. mirovê qelew 2. girê di nava rastahiyekê de, qûç

**qurek:** nexweşîya ku gun tê de her diçe mezin dibe

**qurne m.:** qurm \*\*\**gizêr, pîvaz, kartol we qurne ne: gizêr, pîvaz, kartol bi qurm in.*

**-we qurne:** bi pişt, bi piştevan

**qurs:** mehkem

**quse m.:** xem

**qûçbaz:** 1. kesa ku zarok jê çênabûn 2. stewr

**qûlcik n.:** qolçek

**qûnc m.:** qonc, reh û rîşiyên darê

**qû kirin, hêcandin:** kil lê xistin

**qûqîşte:** kilkil, hêlakan

## R

**rabizdiyan:** (şîr, dew) qetiyân

**raçîyan ketin:** li hevrazê çîyan ketin

**radû kirin:** (bi armanca girtinê) li dûv çûn

**rageriyan:** ser û binê her derê li hev xistin û geriyan

**raketin:** razan

**rameyandin:** tepisandin hundir

**ramîsandin:** ramûsandin

**rapê kirin:** li pey çûn

**rawecandin:** kilkilandin

**razîne m.:** pêlekan

**red m.:** şûna ku ji tiştan dimîne \*\*\**redê kewan le ser berfê maye*

**red bûn:** derbas bûn \*\*\**ez je sînorê xwe ret ûm (red bûm)*

**ref m.:** zinarê bilind

**rejî, rijî m.:** rijî

**rengizîn:** 1. tengijîn, nerehet bûn 2. rengê dan û yek wergirtin

**reşik m.:** cureyekî berê dareke kelemê ya biyanî ye  
**rêce, rîce m.:** 1. rêje 2. rêz, dor 3. bendê ku cil û ber li ser tên raxistin  
**rêpa m.:** peyarê  
**rêpi m.:** rêpî, xercê rê  
**rêkûç m.:** riya koçê  
**rêxistin:** raxistin, bi tertîb danîn  
**rêxok:** cureyekî darên ku dişibihe dolanekê û berên wê sor in  
**ricif:** ricaf  
**riwinc:** kurmekî ku post û daran dixwe  
**rîg n.:** xişir  
**rîs, rês n.:** rîs  
**rîtin:** rêtin, rijandin  
**rîvçalik, rîvî m.:** rodî, rûvî  
**rîvî:** rovî  
**rûtik, xurik:** cuzam  
**rûwepirtik:** tiştê xalxalî

## S

**sa, sewa, sê:** ji bo  
**-sa lûma:** ji ber vê  
**sabirr:** hiriya kurt, sapir  
**salik m.:** sel, kevirê pehn  
**sellat:** kesê ku bi qamçiyên lê dixê  
**selmek m.:** selmask  
**selmequtî m.:** qulopanî  
**-selmequtî xwarin:** qulopanî avêtin  
**sengbêj m.:** bêjînga ku tiştê gir ê pêwist dihêle û biçûkên bêkêr dirijîne  
**serçe:** çivîkên nav kuçe û bajaran  
**serçîl:** heta dêv tijî  
**serendaz n.:** darê ku di nava heçiyê de cih girtiye  
**serestûn n.:** stûnên pêşiyê  
**sergizdan:** hiş tevlihevî

**serlerzok:** kesê serlerizî  
**seripet, seriqij:** porgijik  
**seriqot:** serqot  
**serpel m.:** tehs, careke tehisînê  
**serpel xwarin:** tehisîn  
**sertuştilîk:** qafqire, sercûcîk  
**sexîl:** sexele  
**seyîl m.:** nîvek  
**sêl/sîl m.:** sêl  
**sêtêl, sêtîl m.:** sîtil, beroşa pir mezin  
**silop n.:** sileke mezin  
**silûk, zîlû, (zalo farsî):** zirî, zîro  
**simar n.:** çem, nehr  
**simsime n.:** ardxavik  
**sir, swîr, sûr:** sor  
**sindif n.:** qeyda piyan  
**sindif kirin:** pê kirin qeydan  
**sivîldar, sifîldar m.:** spingdar  
**siwe m.:** sibeh  
**-siwe siweyîn da:** sibeha zû de  
**sîrelaş:** têjika ku teze ji hêkê bûye an jî hatiye dinyayê  
**sîrt:** dîk spartî, hevraz  
**sîxur:** cureyekî ajalên ku dişibihe jûjiyan, lê ji wan mezintir e  
**sozme n.:** toraqa rehn û nerm  
**sukur m.:** stûkur  
**sûsik n.:** sûs  
**sûm m.:** şkeft/qewaxa ku bi dest tê kolandin  
**sûn/sûyîn :** çerm terbiye kirin  
**swîrik:** berê darekê ye

## Ş

**şabal n.:** di baskî de perikê mezin ê ku perinde pê difirin û heke ew ku nebe nikare bifire

**şarrebaran m.:** barana xurt, şirebaran

**şaper/şeverût:** baçermok

**şa wûn:** 1. xweşhal bûn 2. henekê xwe pê kirin

**şayîndaz:** nimûşkar

**şeft n.:** xox

**şeftalû n.:** nektarîn

**şelp, şelpe, belg n.:** belç

**şemitîn:** şiqitîn

**şengijîn:** li ser hejekî man

**şepat m.:** şeqam \*\*\**şepata min guçik kerr kir*

**şerqeşerq m.:** şeqeşeq

**şevçîn m.:** çînê tevnê yê ku bi şev tê raçandin

**şeyd:** tî \*\*ez je şeydan mirim: ez ji tînan mirim

**şêli:** şolî, şêlî

**şigar/cêran n.:** 1. nêçîr 2. xezal

**-şigar lêxistin:** nêçîr kirin

**şimme m.:** xilindor

**şingî m.:** cureyekî giyayê ku li erdê peraş dide û zêde mezin nabe

**şirandin:** şidandin

**şivdoq, dardoq, doqdoq m.:** deqa şivê (lîstik)

**şivîşk n.:** giyayekî ku tûmtûmî hêşîn dibe, li ser keviran jî hêşîn dibe û ji bo sorkirina postî tê bikaranîn

**şiyar kirin:** erd cot kirin

**şîn n.:** xişir, micir

**şîrînciq:** gelekî şîrîn

**şît:** şimşad

**şûjin m.:** derziya hera mezin a ku pê tevê têran û çewalan didirûn

**şun n.:** şûn

**şûn n.:** şûn



**-bi şûn da:** para ve  
**şûş n.:** çilpî, şiv  
**şûş kirin:** (hirî) şiv kirin

## T

**tal:** tehl  
**taq n.:** kit, fer  
**tar m.:** lîs  
**-tar girtin:** lîs girtin, melisîn  
**tasol n.:** kita solê  
**tatanqilîç m.:** texterewan  
**tav m.:** 1. roj, tav 2. tavî, baran  
**taw m.:** ger û zivir  
**-taw dayîn:** gerandin û zivirandin \*\*\*min le dorî xwe çima taw deyî  
**-taw xwarin:** gerîn û zivirîn  
**tekper:** 1. perikekê perindeyan 2. kesê ku bi serê xwe tev digere  
**tele, telam n.:** çiqilê biçûk û ziravik  
**telm n.:** dehf  
**telve:** têkel  
**telvehev:** tevlihev  
**temar m:** reh  
**teme, temî, tem m.:** şîret, teme  
**tene n.:** tirane, tinaze  
**tene kirin:** tinazekirin  
**teng n.:** (bi tya texteyî) bendê ku di bin zikê ker û hespan re derbas dibe û kurtên  
an jî zînê berk digire  
**teni m.:** tenî  
**teniyet m:** (ji bo ku xelq rexne neke tê gotin) rexne  
**tepel kirin:** pê lê kirin, pêpest kirin  
**terepaş:** ber bi baş, li ser piştê  
**terepaş wûn:** li ser piştê ketin, berepaş çûn  
**ternav m.:** şîrotank

**tetik, şede m.:** mûriyên laçikan  
**teh, tey m.:** binê binî  
**teylaşî m.:** tiştê ku li ber maye û malê cemawerê ye, her kes dikare bikar bîne  
**teylax** (bi xeyna erebî): têjikê hêştirê  
**tezî m.:** xumarî  
**têcan n.:** eyarê dêw  
**têl m.:** dehf, leq  
**têl dan:** /bi /t/ya /tûrik/i) mil an jî dest dan tiştêkî dehfdan an jî leqandin  
**têngêh m.:** derteng, tenggeh  
**tiftik n.:** mûyê nerm ê ku jê kuman çêdikin  
**tillar n.:** cihê sergirtî û dorvekirî  
**tile n.:** seg  
**tiriq:** rep  
**tiriq wûn/kirin/sekinîn:** rep bûn/kirin/sekinîn  
**tirîj:** 1. n. parçeyekî ziravik, nazik û dirêj 2. m. tîrêj  
**tîkan n.:** pîjê gulan  
**tîş n.:** 1. dirandina bi deng 2. qelş  
**tîş dan:** qelş lê ketin  
**tîtik:** 1. bebik 2. bîbik  
**-tîtikê çavan:** bîbikê çavan  
**tomelan n.:** (bi /t/ya /to/yî) kûvarkên gelekî mezin  
**tofer n.:** eşîr  
**toqer:** dûajo, şagirdê teze, tor  
**tore:** pêşkenî (berê lîstikek hebûye ku wekî şanoyeke kenîndar hatiye pêşkêşkirinê)  
*\*\*\* de nav xelkê bûme tore.*  
**toxel n.:** pizikên ji ber tirsê di lêvan de derdikevin  
**tozelax:** *bnr* dûlax  
**tu ekî (tu dikî) :** tu qey dibêjî  
**tunik:** seyrek *\*\*\*porê te sa çira tunik wûye*  
**turi, tirî n.:** tirî  
**tuştîlik:** tiştê ku li gorî asta heyî dirêjtir an jî bilindtir e  
**tutûn, dû n.:** dûman  
**tûf n./m.:** tûk, tif

**tûl dan,** (bi /t/ya /top/ê) **pert kirin:** avêtin  
**tûle kirin:** avêtin, tê werkirin  
**tûlik:** şal û kirasê gelekî teng  
**tûlî m.:** (bi /t/ya /tûrik/î) zîpik  
**tûn n.:** (bi /t/ya /tişt/ê) 1. çerm 2. dilq, lisf  
**tûpal n.:** çêreya ku di bin piyan de pirçiqiye  
**tûraq, qetî m.:** toraq  
**tûş, tûşe n.:** 1. (miqdar) derdor, sînor, hudûd 2. rûgeh  
**tûteqizincî m.:** cureyek tûtên ku spî, reş, sor in; û pirçeke hûrik li ser e  
**twîj, tîj, tûj:** tûj

## U-Û

**ustu m.:** stû  
**ûcax m.:** şûna ku agir lê tê vêxistin

## V

**vebirûskîn:** diçurise, dibiriqe \*\* hengulûskê zêr vedibirûske  
**veliyân:** bihujîn, vehelîn  
**vendê:** li vir  
**verketin:** derketin  
**veşe/weşe kirin:** şiyân, şe kirin  
**vetemirandin:** damirandin  
**vexemirandin, xeva kirin, xamûş kirin:** damirandin  
**vexwesiyân:** vehesîn, şîyar bûn  
**vêl:** pehn  
**vîjik n.:** vîjik (îshala xurt û zexm)  
**virik n.:** virik (îshala nerm û sivik)  
**vinî:** vinvinok, ginginok  
**vit bûn:** ketin valahiyê, bi ser re derbas bûn \*\*\*gere min piyê li top xista, lê piyê  
min vit bû û li topê neket  
**vîr:** çivîkeke ji kewan biçûktir û di rengê xweliyê de

## W

**westiyan:** jar bûn

**weris n.:** werîs

**we gîlik:** (jin) dilnexwaz

**we gîrr:** dilnexwaz

**we hêlik:** (mêr) dilnexwaz

**we pitik:** kesê ku tehnan li merivan dixê

**weref kirin:** berhev kirin

**we tal:** vala

**we tal kirin:** vala kirin

## X

**Xadê, Xwedê Xweyê:** Xwedê

**xalxalok, pîrik, sûsimsûnî:** xalxalok

**xanteman:** xwedîyê temeyan, daxwazok, çavbirçî

**xar:** xwar

**xas, pêxas:** pêxas

**xefet n.:** xem

**-xefet xwarin:** xem xwarin

**xelal m.:** bardan

**xelat m., pîşkiş n.:** diyarî

**xelte n.:** tûrê ku taybet ji bo tişteki ye, wekî xelteyê laptopê

**xenzûr, xezûr n.:** xezûr

**xeraz m., qindor:** beraş

**xesi, xwesi, xwesî m.:** xesû

**xica, xicaw m.:** dengê

**xij m.:** tîl, cihê ku mirov xwe li dişimitîne

**-xij xwarin:** xwe tîlê xistin

**xilik m.:** xilît

**xilikîn:** 1. bêfilxilît 2. teral

**xilmexar:** xelexwar

**xilor, gilor:** gilover, daîrewî  
**xilxilandin:** tîketîkeyî kirin, hincirandin  
**xir:** bêpejn  
**xir wûn I:** bêpejn bûn  
**xir wûn II:** (bi tîpa xeynê) gindirîn, gêr bûn  
**xirikîn:** ji qirikê axaftin  
**xirnaq m.:** cihê di navbera qirik û çeneyê de ye ku bi şidandina wê mirov zûtir dixeniqe  
**xirzî m.:** sîloya dexlan  
**xişal:** xweşhal  
**xizan:** zarok  
**xwuritî:** kêmasî, feqîrî \*\*\**naxwazim xwurîtiya te biwînim: naxwazim ku te di tengasiyê de bibînim*  
**xurîn:** kesê ku taştê hê nexwariye  
**xurînî m.:** xwarina berî taştîyê  
**xûm m.:** tiştê ku li erdê hatiye dîtin  
**xwezî daqurtandin:** şilahiya di dêv de daqurtandin  
**xêlik n.:** kulavê şivanan  
**xweliarî:** ariya êgir  
**xweşxew:** kesê ku zû dikeve xewê  
**xwêsîrav:** gelek şor  
**xwêsîrav kirin:** pir şor kirin  
**xwili, xwilî, xwali:** xwelî  
**xwiri:** cuzam  
**xwiriş m.:** toraqa ne tam hişk ne jî tam rehn

## Y

**yan:** pal  
**-yan dan:** pal dan  
**ya rinê, ya dinê, ya hînê:** a din  
**yaratû bûn:** bê ser û şûn bûn, axozî bûn  
**yarebend:** destbenda ku diyariya yarê ye û diavêjin zendên xwe.

**yas n.:** şîn \*\*\**ez ê le yasê te rûnim*  
**yaser:** zarokê ku guh nade gotinên dê û bavan  
**yawar m.:** alîkarî  
**-yawar girtin:** alîkarî girtin  
**ya yinê, dinê, rinê, hînê:** a din,  
**yeke:** yekane  
**yekemêr:** mêrê yekane  
**yekeqawan n.:** berazê nêr ê qert  
**yekexur:** kesê ku bi tena serê xwe dixwe  
**yere, tere:** diçe  
**yexal m.:** barana ne pir ne jî hindik  
**yêkane m.:** dêlegura bi tenê  
**yorxe m.:** rêça piyên kewan  
**yorxe kirin:** wekî kewan bi naz meşîn  
**yord m.:** war  
**yox:** winda  
**yox kirin:** îmha kirin

## Z

**zac:** jina ku di deh rojên pêşîn ên welidînê de ye  
**zarve kirin:** tiraneyê xwe pê kirin, zimanê xwe jê re derxistin, çavên xwe jê re çîrovîro kirin  
**zaw m., nal m., kal m.:** newal  
**zayîn:** hemla xwe danîn (ji bo jinan û beş ajalan) \*\*\**bûka me zaye û lawikek aniye*  
**zere m.:** apandîs \*\*\**eger te zereyê xwe heye, were vira (gefek e)*  
**zerik:** rofirîn  
**-ro çûye le zerikan:** ro çûye ber ava, ro firiye \*\*\**ta ro le zerikan çû, ez jî we rê çûm: heta ku ro çû ava ez jî meşiyam*  
**zerikîn:** zerîn  
**zeweç n.:** çenge  
**zexal n.:** (bi xeyna erebî) komira menqelê  
**zinc n.:** 1. xirî, zemqa daran 2. çesp

**zincirîn:** 1. zeliqîn 2. cemidîn, qerisîn  
**zile:** westiyayî  
**zile wûn:** westiyan  
**zikê biçik:** zikê biçûk  
**zikine:** kesê pir xurekxur  
**zikreş:** timakar, çikûs  
**ziktirix:** ziktêrdek, zikmezin  
**zimang n.:** qûzê, talde  
**zimelûlik m.:** rîşiyên qeşayê  
**zirt m.:** piz  
**zirt kirin:** piz kirin  
**zîlan n., zil m.:** cureyekî gulan e  
**zîlepa m.:** (bi /p/ya /pirç/ê) pêlekan  
**zîp m.:** çiksekinîn  
**zîp kirin:** çik sekinîn  
**zoqme kirin:** 1. (ji bo keran) gayîn, tê re kirin 2. argo. gayîn  
**zumzuq m.:** kulma ku li zik û kêlekan tê xistin  
**zûlî, zûlo, silûk:** zirî  
**zûpe:** rewşa serberjêrkirin û qûnqulozkirinê  
**zûp kirin:** serê xwe berjêr kirin û qûna xwe qulozkirin  
**zûtik:** hundirê qûnê

## Çavkanî

- Çiyan, Gabar. (2014). Hevpeyvîna digel Şoreş Reşî re, li Kurdên Xorasanê.  
<https://www.rojevakurd.com/kurden-xorasane/> (last accessed 21.03.2017)
- Elewîferd, Yehya. (2012), *Şelpe û Sêv*, Qum
- Ferhadî, Haşim. (2011), *Qehremanan (Serdar Êwez Xanê Celalî)*, Şîrwan.
- Husêynpûr, Îsmâil. *Gulîl*, li ser bloga wî ya kesane:<http://www.heraywelat.blogfa.com/>  
(last accessed 21.03.2017)
- Izady, Mehrdad. (1992), *The Kurds: A Concise Handbook*, Washington
- Madîh, ,Abbas-'Ali. (2007), *The Kurds of Khorasan*, li *Iran and the Caucasus* 11 (1),  
pp. 11-31
- Oberling, Pierre. (2008), Khorasan i. Ethnic Groups, li *Encyclopedia Iranica*  
<http://www.iranicaonline.org/articles/khorasan-1-ethnic-groups> (last accessed  
21.03.2017)
- Oremar, Kakşar. (2005). Hevpeyvîn bi Nivîskar, Lêkolînan û Dîrokzanê Kurdên  
Xorasanê,
- Shekofteh, Afrasiab. The Kurds in Khorasan, North-east of Iran  
<http://www.pen-kurd.org/englizi/varia/The-Kurds-in-Khorasan.pdf> (last accessed  
21.03.2017)
- Sipahî, Elî Rîza. (2012). Tu Le Malo. li *Zanîn Kurmancî*, <http://zanin.ir/tu-le-malo.html>  
(last accessed 21.03.2017)
- Tewehudî (Kanîmal), Kelimullah. (1993). *Hereketê Tarîxî yê Kurd be Xorasan*  
*I (Tevgera Dîrokî ya Kurd Ber Bi Xorasanê Va)*, Meşhed<sup>4</sup>.
- Tewehudî, K. (2002) *Dîwana Ceferqulî Zengilî*. Meşhed

---

<sup>4</sup> Ji bo hemû cildên Tevgera Dîrokî ya Kurd Ber Bi Xorasanê Va, Kelimullah Tewehudî  
<http://aliliavaly.persianblog.ir/post/801/> (last accessed, 21.03.2017)